

Ziman û Zar

salî sêyem_ jmare (9) (gelarêzan_2723) (payîzî_2023)

Govarekî zimannasî ya werzî ye

Xudan îmtiyaz:

Dr. Teha Resûl

Sernivîser:

Fereydûn Saman

Sernivîserê fexrî:

tofîq wehbî beg

Desteya şîretgerî:

d.wirya omer emîn

d,hogir mehmûd

d.mizgim çali

d.bêstûn hesen ehmed

kameran rehimî

Rawêjkara kargêrî:

Evîn ehmed

Rawêjkarî Yasayî:

Salim Selman Kûbeçî

Ziman û Zar

salî sêyem_ jmare (9) (gelarêzan_2723) (payîzî_2023)

Govarekî zimannasî ya werzî ye

Serrastker: kûkman m.şilanî - mesod lawe

dîzayn: umêd mihemed

çap: 2023

tîraj: 500 dane

nirx: 5000 dînar

çap: çapxaney taran



komelgey perwerdeyî margrêt

derî dekat

ji bo peywendî bi kovara ziman u zarî:

fereydunsaman61@gmail.com

00964 750 448 0493

Hevpeyvîn bi Kinyazê Îbrahîm re,

■ Hejarê Şamilêv

ku profesorê wêjeyê, akademîsyen û serekê Yekîtiya Kurdên Qazaxîstanê ye.

Di sala 2006'an de me bi profesor Knyaz Îbrahîm re sohbeta jêrîn kiribû. Pêşî li ser malpera kurdiştî-n-poşt.eu hat weşandin. Paşê me ew di pirtûka “Jiyanek Di Rêya Welatparêziyê de” ya ku behsa riya jiyanê profesor dike, dubare weşand.

Kînyaze Îbrahîm du sal berê di 09ê Tebaxa 2021ê de koça dawî kir. Ew di 01 Gulanê 1947 de ji dayik bûye. Îro rojbûna wî ye. Heger sax bûya, dê 76 saliya wî me – hemî dost, heval, xêrxazên Wî bihevra pîroz bikira...

Em îro li hev nehatin. Ciyê wî xuya ye û em bi hesret bi bîr tînin.

Mîn her tim jê re digot «Apê Kînyaz», lê em pê re heval bûn, bêyî ku ferqa temenê navbêyna me 18 sal bû.

Me di sala 2006an de wek du hevalên nêzîk sohbet kiribûn û ev hevpeyvîn derketibû holê. Di hevpeyvînê de de fikrên girîng hene û îro jî qet girîngiya xwe wînda nekiriye.

Bîxwînin!

Bawer im, zehf sûd werbigirin.

Kînyaz Îbrahîm ra hevpeyvîn

“LI SER REWŞENBÎRAN MUXALÎFÎ Û ALÎGIRÎ TÊ ÇESPANDIN”

Sala 2006

Hevpeyvîn bi Knyazê Îbrahîm re, ku profesorê wêjeyê, akademîsyen û serekê Yekîtiya Kurdên Qazaxîstanê ye.

“Mirovê xwedî hizir, gava ku ji rêxistînekê re bi temamî dibêje ”erê” dibe propagandavanê wê û gava ku bi temamî wê rêxistinê xirab dike, dibe dijberê wê. Divê em hêzan bi rengê xirab û qencan hilnedin dest. Ji ber ku weke ku di navbera mirovan da yê bi temamî qenc an jî xirab

tunene, di rêxistinê da jî tunene. Her kes bi livandinên xwe carna pêş dixin û carna jî paş va dixin û her wiha xwedî pratîk û politîkayê ne. Hebûn na, livandinên mirovan dikare bibe mijara rexneyan.

Li ser rewşenbîran timê muxalîfî û alîgirî tê çespendin. Bi ya min ê ku muxalîfiya rewşenbîr bi wateya sekna serbixwe bê pejirandin. Ew muxalîfiya siyâsî û alîgirîya siyâsî ku tê çespendin, bi îtbara xweserîyê ne cuda ne. Lê belê ew ronahîbûna ku tu destnîşan dikî, ew ronahî ye ku raserê bergeha siyasetê ye.

Divê rewşenbîr di hemû qadên jîyanê yên weke civakî, siyâsî, wêjeyî, çandî û hwd. da muxalîfiya xwe ya ramanî nîşan bide. Lê belê muxalîfiya rewşenbîr divê bi şertê afirandinêrîyê va girêdayî be. Rewşenbîr tenê bi rexne na, bêtir jî bi afirandinê va serbar e. Rexneya wî veşartî ye, di qencîrînê da, di rastîna da û di xweşîkirînê de. Ev çemka rewşenbîrîyê dikare rewşenbîr bide rûniştandin, di jîyana civakî ya laîq de.”

Knyazê Îbrahîm

Zanyarê rojhilat, kurdnas, rexnegirê wêjeyê, wergêr, doktorê zaniştê filologîyê, profesor, akademîsyenê Akademîya Zaniştên Dîbanên Bilind ên Navneteweyî û Akademîya Zaniştên Civakî ya Qazaxîstanê û serekê Yekîtiya Kurdên Qazaxîstanê.

Di 1'ê Gulana 1947'an da li Ermenîstanê ji dayik bûye.

Knyazê Îbrahîm (Mîrzoyev) salên dirêj di Ûnîversîteya Dewleta Ermenîstanê da serekîtiya ziman û wêjeya Azerbaycanê kiriye. Di şerê navbera azerî û ermenîyan da kurd mecbûr bû ku koçî berî Qazaxîstanê bivin. Niha di Ûnîversîteya ser navê Abayê dewletê li Almatê serekê navenda zimanên cîhanê ye.

Knyazê Îbrahîm li bajarên weke Parîs, Berlîn, Bruksel û yêd mayînda endamê desteyên zaniştî yên Enstîtû û Ûnîversîteyan e. Li bajarên weke Almatê, Moskva, Sankt-Petersburg, Tiflîs, Parîs, Berlîn, Amsterdam û Bruksel beşdarî konferansên zaniştî û teorîk bûye.

K. Îbrahîm bûye endamê yekîtiya nivîskarên YKSS, serekê para Azerbaycanê ya yekîtiya nivîskarên Ermenîstanê û redaktorîya kovara “Edebî Ermenîstan” kirîye. Niha jî endamê yekîtiya nivîskarên Qazaxîstanê, endamê yekîtiya rojnamevanên Qazaxîstanê û endamê PENa Kurde. Her wiha rêdaktore kovara ”Nûbar”e ku li Almatê dertê û nivîsên zimanê kurdî, rûsî û qazaxî tê da peyda dibin.

K. Îbrahîm di jîyana civakî û sîyasî ya kurdên Sovêt û Qazaxîstanê da xwedî roleke aktîf e. Endamê Parlementoya Kurdiştanê ya li Sirgûnê ye. Dîsa di sala 1991’ê da bûye serekê kurdên YKSS’yê. Her wiha cîgirê serekê Yekîtiya Komeleyên Kurd ên Navneteweyî ye.

Pirtûka wî ya dawî ”Ansîklopedîya kurd a biçûk” hatîye wergerandin ji bo zimanên rûsî, îngilîzî û qazaxî. Dîsa heman pirtûk tê wergerandin ji bo zimanê holendî û tirkî.

Di sala 1998’an da ji ber xizmeta xwe ya di warê hindekarî û jîyana civakî da, ji hêla Komara Qazaxîstanê va madalyona ”Rêzdarîyê” wergirtîye.

Zimanên weke kurdî, azerî, rûsî, ermenî, farisî, tirkî, qazaxî û ûzbekî dizane.

Bi akademîsyen Knyaz Îbrahîm Mîrzojev re di meha sibata 2006’an da, li bajarê Almata Qazaxîstanê, min ev rêportaj pêk anî. Min destpêkê berîya 11 salan gotinên ku di navbera me da derbas bûbûn anî bîra wî:

ME ŞERÊ NAVXWEYÎ DI SEDSALA 20. da HIŞT

Hejarê Şamîl: Mamoşte Knyaz, di sala 1995’an da min tu di dema ”Konferansa kurdên CDS” da li wê hotêla ku tu lê dimayî da zîyaret kiribû. Di wê pêvajoyê da di navbera rêxistinên kurdan da şer hebû. Çendî ku me nexwestebû jî bingehe sohbeta me ew mijar bû. Min wê demê alîyê hêzekî girtibû ku di nava şer da bû. We bi sebireke mezin

gotinên min ên tijî peyvên propagandayê guhdarî kiribû û van gotinên hanê rêz kiribû, ku minê ti carî ji bîr nekiriba:

“Birazî, ez heştên te fam dikim. Çi gumana min ji jidilbûna te nîn e. Lê belê zimanê rastînan ne weke zimanê heştan e. Du kurd li hember hev çek radikî û heke kurdê sêyem ranabe û vî şerî nade rawesitandin, ew dibe hevparê vî sûcî. Her wiha di vî şerî da em tev sûcdar in. Dema ku kurd bi rengekî rêxistinkirî li hember hev çek bi kar bînin, ew dibe tragedîya neteweyî. Alî girtin ne ew nêzîkatî ye ku tragedîyê ji holê rabike. Ger alîgirtin pêwîst bike, divê ew bibe alîgirtina yekîtî, yekbûnî û aşîya navbera kurdan. Ew kesê ku ji xwe re dibêje ez rewşenbîr im, nikare ji bilî vê bibe xwedîyê sekneke din. Ger sekneke din li ser xwe pêk bîne, hingê dê bi benzîne bazde ser êgir. Hemû rêzanên kurdan destnîşan kirine ku, bingeîn sedemê faciaya dîrokî ya ku gelê me dij e, şerê navxweyî ye. Yek ji van ê ku vê rewşê baş pênasê kiriye Ehmedê Xanî ye. Berîya çarsed salan wiha gotîye: “Ger dê hebûya me îttîfaqek / Vêkra bikira me înqiyadek / Rom û Erebb û Ecem temamî / Hem>yan ji me re fikir xulamî”

Ger em Ehmedê Xanî weke kesayetekî kurd ê bilind bihesibînin, divê em qîmet û hêjayî bidine ramana wî. Divê pevçûn û şer di nav kurdan da ne heştên alîgirtinê, lê heştên şermê bide avakirin.

Lê belê dinya diguhere, kurd jî bi wê dinya ku diguhere re, divê ji nû va vegerin û li xwe mêze bikin. Ew pevçûnên bixwîn ên navbera kurdan ne çarenûs e. Bi ya min dê gelê me wan pevçûnên di sedsala 20an da bihêle û wisa bikeve sedsala 21.!”

Çendî ku wê demê ji van gotinên we bibandor bûbûm jî, min wê bawerîya xwe ya ku min digot rast e û alîyê ”yê ku mafdar e” girtibû. Lê ji ber ku li hember we rêzdarîya min hebû, min pêwîstî neditibû bi xwe re ku we bibersivînim.

Niha em di 6 salîya sedsala 21. da ne. Ew pevçûnên di navbera rêxistinên kurdan da di dawîya sedsalê da xwe nîşan dabûn. Ji bilî bûyerên kuştinê yên ku di navbera rêxistinên da qewimîbûn, çek di dest da em pev naçin. Ew lîderên kurdan ku her yek ji wan alîyekî şer bû, ragihandinên mînanî "ji niha û pê va dê kurd li hember hev çekê ranekin" ku dilê mirov xweş dike bi lêv dikin. Pratîkên ku têne sepandin van ragihandinan piştraşt dikin. Hizra min ewe ku di navbera kurdan da pevçûnên rêxistinkirî qedîyane. Gelê me dê careke din destûr nede van tragedîyên wiha neteweyî.

We berîya deh salan weke pêxemberekî gotibû "Dê gelê me wan pevçûnên di sedsala 20an da bihêle û wisa bikeve sedsala 21ê" û ez ji ber vê pêşbînîyê we pîroz dikim. Ger ku hûn di vê pîrozkirina derengmayî da qisûrekê nebînin...

Knyazê Îbrahîm:

Piştî ku Yekîtiya Sovêtê hilweşîya, eşkere bû ku rastîya kurd a ku di bin sîya bîrdozîya bloka sosyalîst da biçim girtibû bi pêvajoyê re wê rengê xwe biguhêre. Rewşa objektîf, rengê veguherîna cîhanê û faktorên konjûktûrel vê nîşan didan. Mercên sûbjektîf ên derveyîn û hundirîn tenê dikaribûn leza projeya veguherînê kêmkirin an jî zêde bikin. Bi konjûktûra navneteweyî ya ku piştî salên 1990'î tevgerên azadîya kurd fersend peyda kirin ku pratîk û pêvajoyên xwe yên pêşveçûnê bi rengekî kûr di ber çavan re derbas bikin. Ev fersendên çonayetîyê weke rêpîvanekê di wan pêvajoyên serûbinbûnê da rû didin. Kurd giran ketin di karê xwe gihandina pêvajoyê da, lê bê tevger jî neman.

Cîhana du cemserî ji alîyê bandora faktorên derveyîn va guncav bû ku bêahengîyekê biqewimîne di şûngehê sîyasî yê kurd û nakokîyên navbera kurdan de. Yek jî, berevajîyê weke ku dihate payîn, Sovêt ku ti carî tevkarî nekirine ji bo pîrsa kurdî, çî projeyeke wan tunebû û nebû

ku xwestekên azadiya siyasi ku bi rengê serxwebûn, federasyon an jî otonomîyê dihatine formûlekirin. Yekîtiya Sovêti weke faktorê alîkar li pîrsa kurdî di polîtîkayên Tirkîye, Îran, Îraq û Suriyê de nihêrtiye. Faktora kurd jî aliyê Sovêti va bi taybetî jî bo wan dewletan, di giştî da jî bandor û destwerdana li ser Rojhilata Navîn bû. Û projeyeke Sovetan tunebû ku kurdan di Rojhilata Navîn da bîne rewşeke bandordar û statûkvoyên heyî biguherîne. "Navenda vebûna cîhana ereb, Îraqa dost ku li hember împeryalîzmê serî radike", "Meyildarê sosyalîst, Suriya dijberê împeryalîst", "Ji aliyê jêopolîtîk û aborî va Îrana dost ku dijminê împeryalîzmê ye" û "Tevî ku di eniya împeryalîst da ye Tirkîyeya bêxisar" Sovetan nerihet nedikir, bi gotineke rasttir, bi gor berjewendiyên rêveberiya Moskvayê bû. Bi taybetî piştî salên 70î ew bawerîya îdeologên sosyalîst ku digotin emê şoreşa sosyalîst li tevahî cîhanê belav bikin rahejiyabû. Berevajî ev rewşa ku li Sovêti dihat jîn, hêviyên kurdan jî YKSS bi bingeş bûn. Bloka kapîtalîst ku kurd bi rengekî bêbawerî nêzîkê wan dibûn, jî ber hevsenga Sovêti xwe nedidane ber ku li Rojhilata Navîn guhertineke rehdar pêk were. Berevajiyê vê jî rast bû. Sovêti ku cîhan bi kapîtalîstan re parve kiribûn, pêmen bûn jî wê hewes û hêza xirabkarîya hevsengê. Di dawîya salên 70î da YKSS destwerdana Afganistanê kir û tê da asê ma. Ev yek hişt ku hemû hewesa Sovêti ya belavbûnê bişikê. Ew gel û civatên ku li Rojhilata Navîn di rêkên cuda da têkoşîna xwe didan, hêza wan tunebû ku wê statûya li dijî gelan hatiye avakirin bişkinin.

Mixabîn, manêvrayên ku kurdan di navbera herdû sisteman da bi rengekî neçarî pêk anîn, wan nebîr encamên rehdar. Tenê dihişt ku rojên xwe bi têkoşînê felat bikin. kurd di navbera sistem û dewletan da erçiqandî mabûn û bûbûne mehkûm ku di navbera xwe da jî wê polîtîkaya kevneşopî ya şerê navxweyî bidomînin. Ew dewlet û hêzên mêtînger ên

sereke ku di hundirê herdu sîstêman da cih girtibûn, kurdan bi renekî stemkar bi kar dianîn. Hilweşîna Sovêtan dê guherînên bingeîn anîbana ji bo kurdan. Dê fersendan afirandibaya ji bo çareserîya pirsê kurd.

Şerê navxweyî, weke rastîyekê encamê bêçareserîyê bûn. Navekî din ê xilasbûna şerê navxweyî, ber bi çareserîya pirsê kurd va çûyî e. Bi hilweşîna Sovêtê re dihate dîtîn ku dê pirsê kurd bi vî an jî bi wî şiklî bikeve rîya çareserîyê. Bi mantiqekî wiha divê neyê hizirandin ku li pêşîya pirsê kurd aştenga bingeîn Yekîtiya Sovêtê heye. Mebest ewe ku sîstêma du cemser û aştê nakokîya di navbera wan da, hiştibû ku ev pirs were halê bêçareserîyê.

EM JI QONAXA BELAVKIRINÊ DIGIHÊN QONAXA AVAKIRINÊ

Hejarê Şamîl: Profesor, hûn bawerîya xwe ya berîya 11 salan diparêzin? Şerê navxweyî yê kurdan, gelo li paş ma? Gelo daxaza mezin ya Ehmedê Xanî dikeve qonaxa pêkhatinê?

Knyazê Îbrahîm: Bê guman diparêzim. Dilşa me. Vekolîna nîvenga sîyasî, civakî û aborî ya li Kurdistanê ava bûye, derfet dide ku em baştirîn karibin xwe bigihînin pêşbînîyên pêşerojê. Di panorama Kurdistanê da xetên hevî diafirînin zêde ne. Parametrên hizra me tî gihertin. Em jî qonaxa belavkirinê digihên qonaxa avakirinê.

Hejarê Şamîl: Ger ez îro bi profesorekî wêjeyê re, ku di mijarên ziman û wêjeyê da bûye layiqê navdarîya akademîk dîr û dirêj ser sîyasetê gotûbêj dikim, ne jî xwesteka min tê, jî ber neçarîyê ye. Bavê min ê xwedê rehma xwe lê bike timê digot: "Te peyva kurd bi kar anî, jî wê gavê pê va tu sîyasetê dikî." Bi rastî jî wisa ye. kurdê bêdewlet, ziman, çand û hemû hebûnîya wê ya neteweyî ku di bin zextê da ye, em mafên sîyasî û çandî deynin wî alî, çîroka wî ya ku vegotina wê çêlekê dike, ku

ketîye boştanê cînar, weke sîyasî tê fêmkirin. Ev jî nakokîya çarenûsê ye. Hûn weke profesorekî ziman û wêjeyê, ku hemû jîyana xwe daye ser rîya doştanîya wêje û gelan, li gelşa têkilîya kurd û sîyasetê çawa dinêrin? Ez bi xwe di wê gumanê da me, ku sîyaseta kurd tenê ji alîyê ew kesên ku navê wan sîyasetmedar e tê meşandin.

Knyazê Îbrahîm: Şamîl Esgerov, rehma xwedê lê be, ew kesayet e ku gelek xizmet daye gel û kurdekî ansîklopedîke. Mirov nikare tenê peyveke wî jî bavêje der.

Tevî ku Ehmedê Xanî û Cegerxwîn temsîlkarên bêhempa yên gîyana gelê kurdin, ramana sîyasî ya kurd anîne ziman, xistîne sîstem û bi zimanekî lîrîk vegotine. Ma sîyaset ne ew hunerê parastîna berjewendîyên wê civata ku tu xwemalê wî yî? Dibe ku Ehmedê Xanî sîyaseta pratîk nekiribe, lê belê di formulekirina ramana sîyasî ya kurd da, di sefandinê da xizmeta bêhempa daye. Cegerxwîn ew helbestvan e ku, bi jîrekatîya lîrîk û sîyasî girse rakirine ser pîyan. Hunermendê hemçerxê me Şivan Perwer di livandina dînamîkên civaka kurd da qasî serokê rêxistînekê xizmet kiriye. Têkilîya wêje û hunerê bi regekî neyekser bi sîyasetê re heye.

EZÊ TIRKÎYÊ BIDIME DADGEHA MAFÊN MIROVAN A EWRÛPA

Hejarê Şamîl: Hûn bi tirkî baş dizanin. Hûn li Qazaxîstanê ji bo zarokên tirk programên dersê amade dikin. Bi gotina akademisyenê qazax, "bavîtiya zarokên tirk" dikin. Salên dirêj di ûnîversîteya dewletê ya Erîvanê da hûn bûn dekanê fakûlteya ziman û wêjeya Azerbaycanê. Bi sedhezaran azerî li Ermenîstanê dijîyan û tenê yek fakûlteya azerî hebû. Bi gotina akademisyen Nadir Nadirov "kurd bû kurd jîya" ku kurdekî li wê fakulteyê dekantî dikir, ev yek tiştekî mezin bû. Niha mijara me ne eve. Ez dixwazim mijarê bînim bûyereke dawî. Knyazê Îbrahîm,

ku jîyana xwe daye ber rîya doştanîya gelan û derheqa doştanîya gelên kurd û azerî da berhemana afirandîye, li balefirseha Stenbolê nehiştin ku bikeve hundir. Bi "fermana wezîrê karê derve" hûn hatine zivirandin ji bo Almatê. Divê ev yek çawa bê ravekirin? Dibe ku ez heştê we ya bawerîya kûr a biratîya gelan biêşînim, lê belê ez van gotinan nebêjim ezê hedar nekim: "Tirk ji ber ku kurdan weke gel nahesibînin û ew kesên ku ji xwe re dibêjin em kurdin weke mirov nabînin, xebata we ya bi navê doştanîya wêje û gelên kurd û tirk ji bo xwe weke heqaret hesibandine û ji ber vê sedemê hûn nexistîne hundirê welatê xwe."

Knyazê Îbrahîm: Di 19ê îlona sala 2005'an da demeke dirêj ez li balafirseha navneteweyî ya Stenbolê dame sekinandin û paşê hatime zivirandin. Ev bûyereke wisa ye ku ji her şiroveyê re vekirî ye. Welatekî ku dibêje ez dêmokrat im û pî dikole li ber derîyê Yekîtiya Ewropayê, bêtî ti sedem nîşan bide û helwestekî wisa nîşan bide, di serî da piştraşt dike ku bi wan rêgezên ku pejirandîye re nakokîyeke rîşt jîyan dike.

Ez hatibûme dawetkirin ji bo dîroka 2125- Îlona 2005'an ji hêla Dewleta Federe ya Kurdistanê, ku dê festîvala çanda kurd a navneteweyî pêk bihata. Ji bo ku li ser Tirkîyê derbasî Kurdistanê bibim çûbûm Stenbolê. Piştî ku demeke dirêj li wir hatime sekinandin, ji minra gotin ku dê min bizivirînin Almatê. Min ji wan memûran re got "Ez zanyar im, ne têrorîst im. Mafê we tune ye ku hûn min paşve bizivirînin". Memûrekî payebilind wiha got: "Lê belê ferqa we kêma e. Mamoste, hûn jî bi pênuşa xwe cihêxwazîyê dikin!" Ez hê jî nikarim fêma bikim ku çawa mamûrekî payebilind yê tirk dikare li hemwelatîyekî Qazaxîstanê heqareteke wiha bike. Tirkîye bi zivirandina min him zagonên xwe û him jî zagona mafê gerîna navneteweyî bînpê kiriye. Ji sedemê vê bûyerê, ez amadekarîya xwe dikim ku di dadgeha mafên mirovan a Ewropayê da li hember komara Tirkîyê doz vekim.

EM DIBIN “TEWANBARÎYA NE JI ME” da NE

Hejarê Şamîl: Ev gotinên we dihêlin ku wan xisûsên min negirtibû rojeva xwe destnîşan bikim. Dibe ku hatibe guhê we jî. Min di derbarê we da gelek gotûgotên rêxistinkirî bihîşt. Demekê hinek derdoran jî bo we digotin “zilamê ermenîyan”. Di sala 1989’an da bi deh hezaran kurdan re hûn jî wî welatî hatine derxistin. Paşê gotin “zilamê azerîyan”. Di nivîsên ku di derbarê we da di çapemenîya Azerbaycanê da derketine dîyar dibe ku hûn weke “non grant” (zilamê nayê xwestin) hatine ragihandin. Di van salên dawî da jî hûn bûn “zilamê tirkên”. Lê hûn jî amadekarîyên xwe dikin ku di derbarê Tirkîyê da doz vebikin...

Knyazê Îbrahîm: Birazî, çi kêmanî û zêdayîya gelan ji hev nîn e. Doştanî û biratîya gelan jî ne têgehên razber in. Doştanîya gelekî bi yê din re, bi doştanîya wan kesên din pêk tê. Bi sedan dostên min ên azerî, ermenî, tirk, qazax û rûs hene. Em bi hizra ku emê tevkarîyê jî bo gelên xwe bikin nebûne dost. Têkilîyên normal yên mirovanî yên di navbera du mirovan da xwe gihandin doştanîyê. Lê belê heke me nasnameya xwe ya êtnîk biçûk dîtibaya, bi misogerî meyê nikarîbûya doştanî ava bikira. Ji ber ku ermenî û azerî û tirk qirên dikin, ez nikarim piştî xwe vegerim dostê xwe yê ermenî yan jî yê din. Felsefeya min a jîyanê eve. Qasî kurdan jî gelên din jî dostên min hene. Lê belê ez kurd hatime dinê, kurd jîyam û ezê weke kurdekî bimirim. Ew gotûgotên ku di derbarê min da belav bûn jî, karê wan kesan e ku dev ji neteweyên din berde, bi mirovên xwe re jî nikarin têkilîyeke mirovanî deynin. Karê wan kesê jî xwe aciz e ku ji bo gelê xwe nikarin kevirekî deynin ser hev.

Berîya çend salan ji bo daîreyên dewleta Qazaxîstanê di derbarê min da gelek nameyên gilîkirinê hatibûne nivîsandin. Di nameyekê da dihate nivîsîn ku ez bi dewleta tirk re di nav têkilîyan da me û li mala min wêneyê Atatürk heye û di paragrafa din da jî dihate gotin ku ez endamê rêxistina PKK’yê me...

Di sala 1995'an da di rojnameyeke tirk a mezin da dihate nivîsîn ku ez serekê navenda kurd a virê me û bi rengê "PKK li Qazaxîstanê" manşet vekiribû. Ji xwe mantiqa wan kesên nexweşê gîyanê wisa ye.

Jîyana rewşenbîrekî kurd ku ramana azad diparêze û şewaza livandina serbixwe bingeş digire, bi zehmetî û zorîyên mezin derbaz bûye. Bi îdîaya ku nêzikî hêzekê yî, ji alîyê hêza din va têyî tewanbarkirin. Rewşa min balkêştir e. Min sekneke serbixwe esas girtîye û min tim xweştîye ku bi her kesî re di heman dûrbûnê da bim. Tevî ku kes wêrekî bi xwe re nabîne û li hember min nabêje jî, ji paş va ji alîyê gelek kesan va hatime tewanbarkirin. Ez ji bo vê dibêjim, "tewanbarîya ew kesên ne ji me ne!" A herî bijan ewe ku, tu ji hêla wan kesan va têyî tewanbarkirin ku te ji bo wan 40 salî xizmet daye û hemnijadê te ne...

DIVÊ HEBÛNA RÊXISTINAN NA, KIRYARÊN WAN BÊ REXNEKIRIN

Hejarê Şamîl: "Alîgirtin" mijareke sotîner e. Divê rewşenbîrek bibe alî an na? "Alînegirtin" bi minra wateyeke dîtbarî dide çêkirin. Ji alîyê din va ew rewşenbîrên ku di mijarên wêjeyî, çandî, hunerî û siyasî da ked dirijînin "alîgirtin" a wan bi wateya rast a gotinê sîyekê dadixe ser rewşenbîrîyê. Ji ber ku bingeşîn mercê rewşenbîrbûnê bi pijdana ramanê ber bi muxalîfîyê va çûyîn e. Bi vê wateyê "alînegirtin" a wî qasî ku wî bîne rewşa "dijber" tûj dibe.

Ev pênaseya wê "tewanbarkirina ew kesên ne ji me" li xweşa min hat. Ji ber bandorî û sekna rewşenbîran, ku timê zor li ser wan tê kirin ji bo ku bibin alî, tiştêkî xwezayî ye. We got, "min tim xweştîye ku ji her kesî re di heman dûrbûnê da bim". Gelo di heman dûrbûnê da mayîn dibe raderbirîna pratîka rast a rewşenbîrên rast?

Knyazê Îbrahîm: Wekhevî û di heman dûrbûnê da mayîn sekneke

nispî ye. Ji ber ku tu nikarî wê dûrbûna di navbera xwe û kes, hêz û ramanên cuda da bipîvî. Di vir da mijara gotinê çemk e. Mînak, em gelşê têkilîya bi rêxistinên kurd va hildin dest. Di pêvajoyên cuda-cuda da ji ber raman û pratîkê xwe nêzîkê yekê dibî. Bi rêxistina din re bi regekî xuyayî dûrbûnek pêk tê. Ev, ew pêvajo, polîtîkayên ku ji hêla rêxistinê va tene birêvebirin û pozîsyona ku tê da peyda dibin re eleqedar e. A ku diyarkere eve. Lê belê ji bo rewşenbîrekî, bi rêxistinê re weke dîtbarî nêzîkbûn, bi rêxistinên din re jî dûrbûn, vêca wateyeke bi regekî ku tu dibî berevajîyê wan, dibî dijberê wan bi xwe re nayine. Divê wisa neyê fêmkirin jî.

Rewşenbîrê kurd ne xwedî wê lûksê ye ku nêzîkatîyên bîrdozî, siyasî û pratîk ên rêxistînekê yekser bipejirîne û bikeve rewşa propagandavanê wê. Di dîroka mirovatîyê da kesek nîn e ku bi propagandavanîya sîstemê xwe gihandîye navdarîyê. Rewşenbîrê mezin Mîxayil Şoloxov propagandaya partîya komûnîst a YKSS kiriye, lê belê yê ku ew kiriye rewşenbîr ne propaganda ye, hoştatîya hunerî ya mezin û gîyana wî ya serbixwe ye, ku xwe teyisandîye ramanên wî yên muxalîf. Tu dizanî, Şoloxov di Sovêtê da yekem nivîskar e ku di saxîya xwe da xelata Nobelê wergirtîye.

Mirovê hizirvan, ku rêxistînekê re bi temamî bêje erê dibe propagandevanê wê, ku bi temamî jî bêje na dibe dijberê wê. A baş ewe ku divê mirov hêzan bi gora qenc û xiraban parve neke. Çawa ku di nav mirovan da nîn e, di nav rêxistinan da jî qenc û xirabên mitlaq peyda nabin. Lê belê livbazîya ku pêşve dibe û ya paşve dibe heye. Polîtîka û pratîkên wisa hene. Divê ne hebûnî, lê livandinên wan bîn pesindan û ji bo rastkirinê bîn rexnekin.

A KU REWŞENBÎR AFIRANDÎYE Û YA HERÎ BAŞE, RAST E Û XWEŞIK E, REXNEYA WÎ YE

Hejarê Şamîl: Çi mixabîn e ku rewşenbîrên kurd ên bi sekna Şoloxov di roja îroyîn da mûstesna ne. A raştî di Sovêta berê da Şoloxovê ku xwedî ramana rewşenbîrîyê bû bi wateya helwestê ne xwedî zêde hevalan bû. Rewşenbîrên kurd, bi wateya ku helwesta muxalîfîyê ku ev bingeşîn mercê rewşenbîrîyê ye şûna ku raxin, - ezê bi gotineke pir nerm bibêjim - “ji ber gelek şayişên jîyanî û sîyasî bi tîlarî tevdigerin”. Rewşenbîrên kurd derfetên huner û wêjeyê ku raserî bîrdozîyê ye, di pîvaneke têr da nikarin bi kar bînin. Ev yek jî dihêle ku, di jîyana civakî ya gelê me da şûna ku bibin rêber, zêdetir dibine paşajo. Hûn bi giştî rewşenbîrên kurd ên îroyîn çawa dibînin?

Knyazê Îbrahîm: Ger em pîvanên îdeal xêz bikin û di nav da li rewşenbîr bigerin, em hingê nikarin xwe bigihînin nêzîkatîyeke rasyonel. Di sedsalan da carekê Ehmedê Xanî'yek dertê. Ew kevirên bingeşîn in...

Ez hêvîdar im ku dema em dibêjin helwesta muxalîfîyê, tu wê danexî tenê nav sînoren helwesta muxalîfîya sîyasî. Li ser rewşenbîran timê tê çespandin ku wî têkine muxalîfê sîyasî û bibe alîyek. Bi ya min divê muxalîfîya rewşenbîr bi rengê sekna wî ya serbixwe bê fêmkirin. Muxalîfîya sîyasî ya ku tê çespandin, bi xweserîya xwe ji alîgirtina sîyasî cuda nîne. Lê belê ew rewşenbîrê ku te destnîşan kir, ew xwedî bergeheke raserî sîyasetê ye.

Divê rewşenbîr di hemû qadên jîyanê de; civakî, sîyasî, wêjeyî, çandî... da muxalîfîya ramanî nîşan bide. Lê belê muxalîfîya rewşenbîr bi afirandinê va mercedar e. Rewşenbîr tenê bi rexnekirinê re na, zêdetir jî bi afirandinê re peywîrdar e. Rexne û afirandina wî di ya herî qenc, raşt û xweşik da veşartî ye. Ger çemka muxalîfîyê wisa be, wê demê dikare di nav jîyana civakî da li wî cîyê layiq xwe bide rûniştandin.

TÊKILÎYÊN DI NAVBERA RÊXISTINAN DA MIJARA LÊKOLÎNA ZANISTÎ Û AKADEMÎKE

Hejarê Şamîl: Dema ku mirov qala têkilîya rewşenbîr û rêxistinê dike, mijareke birîndar tê hişê mirov: têkilîya navbera rêxistinan. Dibe ku hûn zêde li ser ranewestîyabin û ev mijareke derveyî warê lêkolîna zanistî be. Lê belê weke kesayetekî ku vekolîna dîroka Kurdistanê pêk anîye û nîvenga civakî ya rojaneyî dişopîne ramanên we girîng dibînim. Weke dîtbarî ez bibêjim: Kengê ku Kurdistan bû du parçe û hetanî sedsala 20an di nav kurdan da binkeya civakî ya herî rêxistinkirî eşîr bûn. Paşê bi bingehe eşîrîyê bi xarekera çîneyîyê rêxistin derketin. Tecrûbeyê van 50 salên dawî, ku têkoşîna rêxistinên kurdan bi rengê neteweyî, rastîneke gelek sotîner deranîye holê. Têkilîyên navbera rêxistinên kurdan ji aliyê yekbûnê va ji têkilîyên eşîrî şûndetir dimîne. Em nebûne nasdar ku ne di parçeyekî da û ne jî li seranserê Kurdistanê ew rêxistinên nûjen rabin û polîtîkayên hevpar ava bikin, bi demdirêji bi hev re tevbigerin. (Piştî destwerdana Îraqê sereke rêxistinên Başûr jî ber zexta DYA û sûdwergirtina konjûktûrel, weke neçarîyekê ketine nav hewldanên avakirina polîtîkayên hevpar). Lê belê di dîroka me da tevî ku eşîran şerên pir bixwînî li dar xistinê jî, li kêleka vê rastîne li hember ew tiştên ku weke dijmin nasîne bi hev re tevgerîyane.

Hûn di derbarê têkilîyên navbera rêxistinên kurdan da çi difikirin?

Knyazê Îbrahîm: Gelek sedemên nakokî û berberîyên navbera yekeyên siyasî yên kurd hene. Lê belê ji wan ku em sê heban derînin pêş, dê ne şaş be:

1. Berjewendîyên çînî û rêxistinî yên rêxistinan hene. Nêzîkatîya wan a ku tîrsa paraştina xwe raserî berjewendîyên neteweyî digirin heye. Hemû avakarîyên siyasî yên kurdan bandor girtine ji mercên xirab û timê xwe li hember “talûkeya mirinê” hîs kirine. Ji ber karakterên xwe

yên çînî, bi wê tirsê jîyane ku derbe bixwin, ne tenê ji hêzên derve ji yên hundir jî. Ew kesên ku di bin talûkeya mirinê da dijî, dostên wan kêr û dijminên wan gelek in.

2. Çonayetiya parçeyê ku rêxistin lê peyda dibe û têkilîyên wê bi hêzên der va re ku hiştiye pê va girêdayî bimîne heye. Rêxistinên kurdan ew rêxistinên welatekî mêtîngeh in ku di navbera çar dewletan da hatîye parçekirin. Asta bandorbûna wan ji polîtîkayên dewletên ku lê peyda dibin û polîtîkaya hêzên derveyî ji wan dewletan re gelek cuda bûye. Dema ku em li dîroka rêxistinan dinêrin kevaleke wiha dertê pêşberî me: Her rêxistin li hember dewleta lê peyda bûye di nava şer da ye û xwe dispêre dewleteke din. Ev weke nêçariyek hatîye dîtin. Gelek rola dewletên mêtînger çêbûye ku rêxistinên kurd li hember hev rabin û bikevine nava şer. Dîsa di herêmê da berjewendîyên împeryalizma klasîk û sosyalişt hebûye û wan jî bi polîtîkaya “parçe bike û bi rêva bibe”, kurdan tenê li hember dijmînên xwe ranekiriye, li hember hev jî rakiriye.

3. Kevneşopîya ku xwe dispêre parçeyan. Objektîf mercên peydabûnê hiştine ku kurd bi rengêkî bi parçe bihizirin û tevbigerin. Di van 5060-salên dawî da hinek rêxistinên Kurdistanî “Kurdîstana Yekbûyî” ji xwe re kirine armanc. Lê dema ku hûn li pratîkên wan rêxistinan dinêrin, hûn dibînin ku xwe rizgar nekirine ji wê çemka navenparêzîya ew parçeyê ku jê derketine. Bêguman, ev çemka navendparêzîyê bi gelek hincetên weke mercên herêmî û sîyasî va hatîye pêçan. Ger hûn hinek din herin kûrbûna wê, hûnê bibînin ku di bin vê mantiqê da ji daneyên zaniştî zêdetir, psîkolojîya navendparêzîya eşîrî heye. Di navbera eşîrîya klasîk û nûjen da gelek alîyên dişibin hev hene. Rêxistinên herî nûjen ên Kurdistanê jî di wî halî da ne ku hê xwe rizgar nekirine ji şewaza rêxistinkirina eşîretgerîya sîyasî.

Di bingeh da mijara têkilîyên navbera rêxistinên kurd, mijareke cidî ye ku divê ji alîyê akademîk û zaniştî va bê lêkolînkirin. Di vê bingehê da hilkeftinên xebata zaniştî pêk hatine û hene. Lê belê çî mixabîn e ku ne çonayetîya van xebatan têrî pêdivîya yekîtîyê kiriye û ne jî encamên zaniştî derfet dîtine ku xwe bigihînin nîvenga sîyasî.

DEWLETA FEDERE YA KURDISTANÊ DI VAN 60 SALÊN DAWÎ da BÛYERA HERÎ MEZIN A KURDAN E

Hejarê Şamîl: Kurdan di sedsala 20an da pêvajoyeke gelek tevlîhev jîyan. Em bi hêvîyên mezin ketine sedsala 21ê. Ji hêla DYA'yê va derbeyeke kuştinê hat lêdan li wê statûkvoya sîyasî ku ji hêla hêzên navneteweyî va hatibû avakirin, di destpêka sedsala 20an li Rojhilata Navîn. Dîyar dibe ku hêzên Rojavayî bi xwe re pêdivî dîtine ku wê sîstema Rojhilata Navîn hilweşînin, ku berîya sedsalekê ji hêla wan va hatibû avakirin. Li Îraqê parçekirina statûkvoyê ji bo Başûrê Kurdistanê derfetê federasyon û dewletbûnê bi xwe re anîye û hiştîye ku gotina mîna “sedsala 21ê ya kurda ye” pêş bikeve. Gelo divê mirov vê yekê bi rengê ku ev nirxandina peşveçûna sîyasî ya cîhanê ye an na bi rengê ku xwestekên me wisa dixwazin, bipejirîne?

Knyazê Îbrahîm: Ji bo ku sedsala 21ê vegere sedsala kurdan û kurd bigihîjin wan mafên xwe yên ku ji zû da maf dîkin, bi zêdetirî derfet derketine holê. Mesele ev derfet rast bikaranin e. Em nikarin qala wan bextewarîyan bikin ku weke xelat li stûyê me kirine. DYA ku îroyîn hêza sûper e, destek dide ku li Başûrê Kurdistanê dewleteke kurd bê avakirin. Ev fersendeke mezin e ji bo kurdan. Ger ew destwerdana der va nebana, birayên me yên Başûrî nikaribûn xwe bigihandana vê encamê. Heman rewş ji bo parçeyên dîtir jî derbas dibe. Ji bo ku kurd bigihîjin azadiya xwe dînamîkên hundirîn bingeh in, lê bele îro

li Rojhilata Navîn ew mercên weke pêzdarez, psîkolojîyên civakî, kevneşopîyên sîyasi, çonayetîya têkilîya dewlet û gelan ku ava bûye, hiştine ku hetanî destwerdana der va pêk neyê, ji bo dema nêzîk ne mimkûn e ku li Rojhilata Navîn statûkvoya paşverû bê şikandin. Ev yek bi zelalî datîne holê ku ev pêk neyê di herêmê da sîstemên demokratîk ava nabin.

Dewletbûna li Başûrê Kurdistanê; çarenûsa gelê kurd ji binî va bandor kiriye û pêşketineke wisa dîrokî ye ku dê dehsalên pêş me dîyar bike. Dewleta Kurdistanê Federe ku bûyera herî mezin a 60 salên dawî ye, divê bê paraştin û pêşxistin. Divê hemû pîlanên xebatê yê sîyasi, çandî û civakî yê gelê kurd ku 45 mîlyon e, di xala yekemîn da cih bigire. Bawerîya min ewe ku ji vê mezintir peywîra pîroz a kurdê nûjen tune. Gava ku birayek mala xwe ava dike, birayên din alîkarî pê didin. Îro xerc, tuxle û hosteyên birayên Başûrî amade ye û temel hatîye avêtin. Birayên Bakûrî, Rojhilatî û Rojavayêbaşûrî ji bo ku avahî kamil bibe, divê şev û roj kevîr rakin û xerca xwe tevî bikin.

KURD LI QAZAXISTANÊ XWEDÎ HER CÛRE MAFÎ NE

Hejarê Şamîl: Birayek jî li dîasporayê ye.

Knyazê Îbrahîm: Belê, belê. Di pirtûka te ya dawî da cihekî mezin hatibû veqetandin ji bo têza “parçeyê pêncemîn” (dikene). Weke ku dor hatê divê ez bibêjim, di 15’ê nîsanê da li Almatê em konferanseke zanîstî-pratîk a navneteweyî bi navê “Gelê kurdê nûjen: rewşa heyî û perspektîf” li dar dixin û em pîlan dikin ku cih bidin van mijarên ku em bahs dikin. Ji ber vê çendê jî ez gazî rewşenbîr, zanyar, sîyasetvan û rojnamevanên kurd dikim ku bi tez û dîtînan xwe destekê bidine konferansê.

Hejarê Şamîl: Em li ser rewşa kurdên dîasporayê û weke şênberî jî li ser rewşa gelê me yê li Qazaxîstanê nesekinîn. Min dît ku li Qazaxîstanê ji bo pêşveçûna gelê me di warê civakî, çandî û perwerdeyî da nîvengeke erênî hatiye afirandin. Di salên derbasbûyî da li Qazaxîstanê dersên zimanê kurdî dest pê kiribû, dewleta Tirkîyê ev yek protêsto kiribû. Qazaxîstan ji wan protêstoyan bandor negirtibû û mafê perwerdedîtina zarokên kurdan paşçav nekiribû. Wisa tê fêmkirin ku ji rêgezên xwe yê demokratîk tawîz nedan.

Knyazê Îbrahîm: Qazaxîstan dewleteke serbixwe ye. Piştî hilweşîna Sovêtê serxwebûna xwe ragihand û paşê jî di warê aborî, civakî, çandî û siyasî da leza pêşveçûneke cidî wergirt. Azadîyên siyasî û demokratîkbûn, bi vê wateyê nasîn û sepa dîna mafên hindikahîyan, di van dehsalên dawî da pêşveçûnên cidî pêk hatine. Di welatê me da ji 100'an zêdetir hindikahîyên neteweyî-êtnîkî hene. Li hember mafên hindikahîyan rêzdarî, paraştin û pêşvebirina ziman û çanda êtnîkî, di bin kontrola serokkomar Nûrsultan Nazarbayev da tê birêvebirin. Birêz serokkomar, bi xwe peywîra serektîya Yekîtiya Gelên Qazaxîstanê hildaye ser xwe. Piştî hilweşîna Sovêtê tekane komar Qazaxîstan e ku mînanî komarên din ên Sovêtê pevçûnên neteweyî û êtnîkî lê neqewimîne. Di welatê me da ku ji sedî zêdetir yekaneyên êtnîkî lê peyda ne, nîvenga xweşbînîyê ku hatiye afirandin û siyaseta neteweyî ku tê meşandin weke mînak e ji bo wan welatên ku dibêjin me bi dehsalan xwe bi sîstema demokratîk bi rê va birîye.

Li Qazaxîstanê ji bo pêşvebirina neteweyî û çandî ya kurdan ti asteng nînin. Berevajî, projeyên çandî û perwerdeyî ji hêla dewletê va destek dibînin. Li her devera ku kurd lê dijîn, di dibistanên bingehîn da dersên zimanê kurdî têne dayîn. Dîsa pirtûka min a bi navê "Zimanê kurdî" ku ji du cildan pêk tê, ji hêla Wezaretê Perwerdehî ya Qazaxîstanê va hatiye qebûl kirin. Ev pirtûk ji bo komên 25- û 69- hatine amadekirin û di demeke nêzik da dê bîr çapkirin û li zarokên kurd bîrê belavkirin. Em

xwedî her cûre derfetên rêxistinbûnê ne. Weke hemwelatîyên wekhev derfetên me yên pêşveçûna aborî û civakî hene.

Bêguman gelek pirsgirêkên me di warê çandî, civakî û perwerdeyî da hene. Ev piranî bingegehên xwe ji me digirin. Em dikarin bi hewldaneke mezintir çareser bikin.

DOSTANÎ HÊZEKE MEZIN E

Hejarê Şamîl: Apê Knyaz, sohbeteke dirêj bû ev. Gelek mijar hene ku ez dixwazim li ser rawestim, lê divê ez wan pirsên xwe bihêlim. Ez dixwazim ku hûn bi gotinên xwe dawî li axaftinê binin...

Knyazê Îbrahîm: Di sala 67'an da helbestvanê me yî mezin Evdirehman Hejar Mukrîyanî hatibû Êrîvanê. Ez pê re weke wergêr çûme Bakûyê. Rojekê ku em di kolanên Bakûyê da dimeşîyan ji minra wiha got: “Keko, dijminên me stemkar in. Maf û peywîra me ye ku em li hember wan têbikoşin û li ber xwe bidin. Lê belê ji bo rizgarîya gelê me, divê em bi gelên cîhanê re dostanîyan ava bikin.” Ev gotin min hizirandibû. Lê belê min wê demê kûrbûna gotinên hoştayê mezin Hejar baş fêm nekiribû.

Pêşveçûnên van deh salên dawî yên têknolojîyê cîhana me biçûk xistîye. Girîngîya mirovê sîyasî û heta ya têkilîya berjewendîyê bilind bû.

Ez ne di wê bawerîyê da me ku cîhan bi awayekî dijminî nêzîkî kurdan dibe. Ruh halîyekî wisa mirovan ber bi berxwedêrîyê va dişemitîne, lê belê nabe encamwergirtina dawî. Ger di bingeh da tu lê binêrî, qasî ku tu diafirînî dostên te hene û qasî diafirînî dijminên te hene. Derfetên me yên afirandina dostan û van ji bo rizgarîya gelê me dane şixulandin, îro ji her demê bêtir in. Weke yekî ku di hemû jîyana xwe da lêkolînên wêjeyî yên mijarên dostanîya navbera gelan hilkolaye ez bibêjim, bawerîya min heye ku emê hêza mezin a dostanîyê bixin bin xizmeta azadîyê.

Sala 2006. Almaati, Qazaxistan

Yek Ji Encamên Asîmîlasyonê: Lixwenebanbûn

■ Dr. Dilawer Zeraq

Asîmîlasyon, wekî demajoyeke ku destpêka wê diyar e û dawîya wê tune ye, xwedî çend encaman e ku ji alî netewe-dewletên mêtînger ve, li ser gel-neteweyên bindest û axa wan dagirkirî, wekî amrazeke serdestî û desthilata derveyîn, bi armanca ‘wekxwekirin’ê tê meşandin. Lixwenebanbûn, yek ji wan encamên ketî behsê ye ku di demajoya pêkanînên asîmîlasyonê de, li kes û endamên neteweyên bindest (kirî) û marastî (exploited) diqewime.

Peyva ‘neban’ di ferhengên kurdiya kurmancî-tirkî de wiha tê pênasekirin: 1) “neban: wek termeke zoolojîyê û cıvati, lawîreka mê ya nûzayi ya ku çêleyeka xwe ya sawa hinê mêtîna bî guhanê nake. (Bozarslan, 2018: 333)” 2) “neban (II): 1. alîşık olmayan 2. yavrsunu emzirmeyen hayvan. (Farqînî, 2004: 1270)” 3) “neban: yê hinde tiştan na pejirînît, nemaze kewalên mê, dema kar yan berxê xwe wernagirit û nahêlit şîrê wê bixot” (Botî, 2007: 433). Di her sê pênaseyan de tiştê hevpar, jixwedûrkirina makê ya berxa xwe ye. Yanî, heyînek heye û ji heyîn (û tiştê) ji derveyî xwe re sar dimîne û jê dûr dikeve. Loma jî, em ê ji vê deqband (kontekst) û çarçoveyê bidin ser rê û wekî wateyeke mecazî, vê wateyê, ji hêla makê ve ku ji berxa xwe dûr dimîne, qebûl bikin û bi wateya ku di warê civakî de tê bikaranîn, bi kar bînin. Em ê peyva neban bi temamî bi wateya, ‘sarbûn, dûrketin, jêçixîn, jêqetîn û jêveqetîna ji xwe, ji heyîn an jî ji tiştêkî ji xwe û nêzî xwe’yê bi kar bînin.

Di warê hîskirin û hayjêbûna heyîniyê de, jihevcihêkirina ‘ez û ew’ê çî di nav çandekê de çî jî di navbera çandan de, qada xwe berfiretir dike û di ser vê berfirehiyê re tê famkirin. Wekî mînak; mirovên ku bawerî bi dînekî tînin an jî nayînin, mirovên ku ji herêmekê ne an jî

ne ji herêmekê ne, mirovên ku maldar in an jî xizan in, mirovên ku ji heman komên etnîkî ne an jî ne ji etnîsîteyekê ne... Ev jihevcihêkirin hemû di roja îroyîn û di biwara têgihdariyê de tê li ser têkiliya ‘ez’ û ‘dîke’yê dimîne. Dîke (other), li derveyî ‘ez’ê ye û ne derbar ‘ez’ê ye. Em ê di vê qonaxê de teoriya Lacan ya neynîkê bînin bîra xwe û bi kurtasî bêjin; Ez, ji bo ku heyî be, ji bo ku were famkirin û hem ew hay ji xwe bibe û hem jî mirovên din hay ji hebûna wî/ê bibin, xwe diyar û pênasê dike. Gava ew vê yekê dike, di heman demê de, xetêke û qadeke ya xwe jî diyar dike; û pê re jî xet û qada heyîna din jî diyar dike û “Ancax dikare bi pênasêkirina van qonaxan bibe ‘ez’” (Kiraz, 2011: 153).

Helbet nebanbûn, ne tenê yekalî ye. Heke em nebanbûnê yekalî bifikirin û bêjin, ‘ez’ek heye û hemû heyînen ji derveyî wê ‘ez’ê neban in jê re, nexwe hemû heyîn ji bo hev an neban in an jî ne neban in. Loma jî, nebanbûn têgiheke wisan e ku berê wê bi xwenaskirinê ve ye jî. Digel wê, kirdeyek ji bo xwenaskirinê hewceyî ‘ez’êke dîtir e û divê wê heyînê jî nas bike. Hegel di diyalektîka ‘efendî-kole’yê de ev yek daniye rastê û dibêje; “Efendî kole nakuje. Ji ber ku efendî ‘xwebûniya xwe ya serbixwe’ deyndarî ‘xwebûniya neserbixwe ya kole’ ye” (1986: 143). Gava em bi baldarî li vê pênasêyê dinêrin, dibînin ku teoriya Lacan ya neynîkê û diyalektîka Hegel ji aliyê ‘hevdivêtiya kirde û tiştê’yê de digihîjin hev. Em di ewledariya vê pevghîştinê de dikarin bêjin, ‘neban(î) û nebanbûn’ ne yekalî ye, lê dualî ye; ev dualîbûn li ser dîkekirinê (otherization) dibe xwedî bingehekê û ji bo hatina naskirinê û ji bo danîna xwebûn(iy)a xwe, -çî serbixwe çî ne serbixwe- her du alî hev divên.

Nexwe em dikarin bêjin, qonaxa dîkekirinê ji aliyekî ve demajoya nebankirinê ye jî. Ji ber ku gava kirdeyek xwe pênase dike, tiştêyekê jî ji xwe re diyar dike; û bi vê diyarkirinê re tiştêyê ji xwe dûr dike; û bi vê dûrêkirinê re jî wê ji bo xwe dike heyîneke ‘xerîb, biyan, namoyî û dereke.’ Dominique Schnapper behsa vê têkiliya ku li ser neyîniyê ava dibe, dike, li ser du şeweyên vê têkiliyê dimîne û dibêje,

“A yekem, ‘Reftara ciyawazkerî ye ku cihêtiya di navbera heyînan de heyî tê çespendin. Ev ciyawazî bivênevê li ser hîma ‘kêmbûn’ê tê avakirin. Yanî gava aliyek pênaseya xwe dike, dixwaze bêje, taybetiyên erênî ku bi min re hene bi ‘heyîna din’ re tune ye” (2005: 25- 26).

Reftara ciyawazker, dîkeyê hem wekî heyîn qebûl dike hem jî wê neyîn (red) dike û van kirinên xwe jî bi dorê dike; pêşî ciyawazkirinê piştî jî neyînkirinê pêk tîne. Ev awa pêwendiya ku bi dîkeyê re tê danîn, gelek rûxîner, tuneke û neyartîhez e. Herçî şeweyê dîtir yê vê pêwendiyê ye, Schnapper di barê wê de dibêje,

“A duyem, ‘Li ser bingeha gerdûnîkerî û asîmîlekerî ava dibe. Ev reftar dibêje, mirov tenê ji ber ku mirov in wekî hev in; û bi vî awayî jî dixwaze bêje, dîke ‘ew’ê dîtir e. Yanî, ‘dîke’ divê wekî ‘ez’ê be, ya ku gerdûnî ye di nav çanda ‘ez’ê de tê asîmîlekirin. Ev jî ew şewe ye ku rengê xwe dide dîkeyê û bi vî awayî wê tune dike” (2005: 27).

Di vê reftarê de, jixwedûrkirina dîkeyê nakeve behsê. Lê belê çendî ku dîke wekî tiştêyekê di nav kirdeyê de diheve, ew çend rengê wê digire û dîsa ji rengê hebûna xwe, ji pênaseya xwe, ji hayjêbûna xwe dûr dikeve û dîke, -yanî tiştêya kirdeyê- bi awayekî ji awayan dîsa tê neyînkirin.

Me di destpêkê de gotibû, nebanbûn demajoyeke dualî ye. Heta vê derê em li ser yekalîbûnê man ku ew jî li ser ‘kirde-tîşte’ yê ava dibe ku aliyek her tim kirde aliyê din jî her tim tîşte ye, yanî dîke ye. Îcar, aliyê duyem yê nebanbûnê ew e ku; mirov bi xwe hem bibe kirdeya xwe hem jî tîştêya xwe; yanî mirov bi xwe bibe dîkeya xwe.

Di vê qonaxê de, mirovek kîngê xwe bide ber bayê guherînê hingê dikare nêzî xwe bibe û dikare bi xwe re têkiliyêke ‘kirde-tîştêyî’ dayne. Gava mirovek bi hişberiyekê dikeve nav demajoya guherînê, bi vê kirina xwe re dibetiya lixwenebanbûnê jî mimkun dike. Em dikarin bêjin; her tîştê ku diguhere hin tîşt û taybetiyên ji teşe û dirûvê xwe yê berê winda dike. Heke wiha ye, nexwe di nebanbûnê de jî guherînek li dar e. Guherîn, di heman demê de, kirasguhertin e jî; û ev yek hem dikare ji hêla derveyî ve hem jî ji hêla navxweyî ve pêk bê. Loma jî, heke kirasguhertin parçeyek ji guherînê be, nexwe “... nebanbûn; bi wateya giştî, bûyîna kesekî ji bilî xwe an jî veguherîna li kesekî ji bilî xwe ye...” (Timuçin, 1992: 16- 23).

Hemin ku her heyîna ku diguhere, êdî rengê xwe yî berê winda dike û dibe tîştêkî nû yê dîtir; û hemin ku “Her guherîn bi awayekî ji awayan nebanbûn e jî” (Kiraz, 2011: 161), em dikarin bêjin; mirovê lixwenebanbûyî mirovekî nû yê dîtir e jî. Pê re jî em dikarin bêjin, nebanbûna ku bi ‘bûyîna’ tîştêkî din, bi ‘bûyîna’ heyîneke din li mirovan diqewime, zêdetir ji ber bandorên derveyî in û mimkun e ku guherînen hundiirîn ne li ser hîm û bingeheke xurt bin. Ji ber ku her çend di ‘bûyînê’ de guherîn hebe jî, ev guherîn ne li ser vîn û hişberiyêke lixweşiyar e. Loma jî, dibe ku her guherîn ne guherîneke erênî be. An jî, dibe ku her guherîn, wekî dongiyekê, ‘nebanbûneke’ erênî bi xwe re çêneke. An jî dibe ku nebanbûna di vî warî de dikeve behsê, ji nebanbûnê zêdetir, tunebûn û windabûn be.

Her wisa, ji bo ku em karibin xweşikî ji ‘guherîn’ê fam bikin, -ya ku Kiraz behs jê dike û wateyeke erênî ya nebanbûyînê lê bar dike-, pêwîst e em berê xwe bidin demajoya ‘xweguhertin’ û ‘xweavakirin’ê. Loma jî, em ê ji serî de hizira xwe daynin û bêjin; ‘xweavakirin’ ne bi ‘guherîn’ê pêk tê, lê belê bi ‘xweguhertin-xweguherandin’ê pêk tê. Ji bo ‘xweguhertin’ê, li mirov merc e ku çandekê biafirîne da ku karibe hem têkiliya xwe ya bi xwe re hem jî têkiliya xwe ya bi xwezayê re saz bike. Ji ber ku mirov bi çanda ku afirandiye, têkiliyên xwe saz dike û çî gava dikeve qonaxa xweguhertinê, ‘xweavakirin-xwepêkanîn’ek jî li dar dixê. Li hêla din, nebanbûyîna kes û takekesan û nebanbûyîna girseyî (an jî civakî) jî hene ku hin caran di civakekê de bes beşek an jî hejmarek mirov hene ku nebanbûyîn li wan diqewime. Karl Marx, hem wekî girseyî hem jî wekî takekesî li ser nebanbûyînê disekine. K. Marx, piştî ku li ser berhênana mirovan ya bi xwe bi xwe re, ya bi mirovên din re û ya bi xwezayê re disekine û wan dadihûrîne, pênaseya xwe li ser hîma ked û berginda kedê datîne û dibêje;

“a) di pergala kapîtalîst de, kesên ku dixebitin ne di sehiya xwe lê di sehiya karsaz de ne, loma jî li keda xwe neban in, b) ji ber ku berhema ku kedkaran ew hilberandiye ne ya wan e lê ya karsaz e, kedkar li berhema xwe neban in, c) mirovê ku li keda xwe li berhema keda xwe neban be li xwe jî neban e, d) mirovê ku li keda xwe neban bûye li heyîn û mirovên derveyî xwe jî neban e” (Marx, 2007: 28-29-31-30).

Di pênasekirina Marx de, bala me diçe ser, ‘xwedîbûna keda xwe.’ Û hema di pey re jî gava em bala xwe didin pênaseya Hegel ku li ser nebanbûnê dibêje,

“Ez’a ku hê negihîştîye hişberiya hebûna xwe, (tez) ji bo ku bigihîje hişberiya hebûna xwe rastî heyîna ku ne ‘ez’ e, yanî rastî dikeyê tê

(antîtez) û di dawiya vê lêrasthatinê de, ‘ez’ êdî ‘ez’ek e ku gihîştîye hişberiya hebûniya xwe (sentez)” (Hegel, 1986: 33- 34).

Em dikarin bêjin, ‘he(xwe)bûniya’ ku bi pênaseya Hegel dide der û nebanbûyîn di ser wê re tê pênasekirin, li ba Marx, bi rengekî din, bi rêya kedê û ‘xwedîbûna keda xwe’ derdikeve rastê. Hegel di ser ruh, giyan û hayjihebûnaxwe re nebanbûyînê dide ber qonaxan û di dawiyê de awayekî azadiyê an jî hayjixwebûneke taybet dispêre takekesan. Marx jî vê azadiyê di ser xwedîbûna kedê re dide takekesan. Di pênaseya Hegel de nebanbûyîn takekesî ye, lê di pênaseya Marx de, nebanbûyîn hem takekesî hem jî girseyî (an jî civakî) ye.

Ji hêla din ve, ‘takekes’ carinan di nav girseyê de wekî ‘her kesî’ ye. José. O Gasset balê dibe ser vê rewşê û der heqê mirovê ku di nava ‘her kesî’ de dijî, wiha dibêje,

“Di dîroka mirovahiyê de, ji bo takekes sê qonax hene ku bi awayekî zêde û geremolî tim dubare dibin; 1) takekes heşt pê dike ku xwe winda kiriye, di tiştên derdora xwe de kûr çûye; ev dîkebûn e, 2) takekes bi hewldaneke xurt dikişe nav kozika xwe û li ser tiştên li dorhêla xwe û li ser serdestiya xwe ya li ser wan hiziran çêdike; ev yek dikûrdeçûna xwebûn(iy)ê ye, 3) takekes car din li dinyayê xuya dike û li gorî pîlana ku berê hatiye kirin, dest bi liv û tevgerê dike; ev jî çalakî, jiyanî çalak, yanî praxis e.” (Gasset, 1995: 38)

Li ser van peytên Gasset bala me car din diçe ser pênaseya ‘jixwedûrketina’ ku Hegel behs dike. Ev pênase li ba Gasset dibe ‘xwejêdûrxistîneke bi (xwe)hişberî’ û ‘lixwevegerîna’ Hegel ku bi bandora tiştên derveyîn pêk tê li ba Gasset bi (xwe)hişberî diqewime û bi ‘çalakî’ li xwe vedigere, xwe heyî dike û nav lê dike ‘çalakiya

jiyanê-praxis'. Her wiha, Gasset bi van peytên xwe re bala me dibe ser takekesê di nav girseyê (civakê) de û em pê dizanin ku; gava mirov di nava 'her kesî' de ciyek bide xwe û piştî xwe li raştîya heyî (an jî li heqîqetê) bizivirîne, li xwe neban dibe. Yanî Gasset jî, bi wateya lêçûnê (dirûvpêketinê) û bûyîna wek dîkeyê; 'bûyîna wek her kesî, bûyîna wek dorhêlê û bûyîna kesê ji derveyî xwe', wekî (li xwe) nebanbûyîn qebûl dike.

Yek ji hêmana ku têkiliyeke xwe ya nêz bi nebanbûnê re heye, çand e. Ji ber ku "Çand, awayekî mirovîkirina xwezayê ye" (Uygur, 2003: 17) ew bi xwe dibe kan û kewara nebanbûnê. Loma jî, di heman demê de, çand; warek e ku mirov bi xwe diafirîne, ava dike û tê de dijî. Ê em dikarin bêjin, çand, wekî berhemeke mirovan, ne xwezayî ye jî. Hemû tiştên di vê berhemê de ji xwezayê dûr in loma jî nebanbûn bi mirovan xuya dike û derdikeve raştê. Her wiha, mirov gava çandê diafirînin, li xwezayê neban dibin. Bi vê wateyê, çand qonaxa tiştêbûnê ye jî. Mirov ji bo ku xwe ava bikin, dikevin nav hin çalakîyan; çanda ku diafirînin, bi çalakîyên mirovane yê "bi rêya ziman, dîn, mîtos, huner, zaniştê" (Cassirer, 1980: 71), ji nifşekê vediguhêzînin nifşa dîtir û hebûna xwe, xwebûna xwe, hayjixwebûna xwe û çalakîyên xwe didomînin. Di domana vê demajoya veguhaştinê de, çand jî mirovan bi pêş dixê û ji ber ku "Çand, helûmerca sereke ya hebûn(îy)a mirovan e" (Uygur, 2003: 18) bi pêdeçûna dem û qonaxên veguhaştinê re, çand û hemû hêmanên wê, dibin rengêkî taybet ya hebûna takekes û civakê. Em dikarin li ser van pêzanînan hizirekê ava bikin û bêjin; hemin ku çand yek ji taybetiyên xweser û sereke ya civakan e û her civak xwedî çandêke taybet e; û ji ber ku her gel û komên etnîk, bi awayekî ji awayan û li gorî xwe, têkilî bi xwezayê re daniye û destkariyên

xwe jî li gorî wê pêk aniye, jihevcihêtiya di navbera civakan de heyî jî diyardeyeke ne xwezayî ye. Loma jî divê guherînên ku di çanda civakekê de çêdibin dîsa bi destê endamên wê civakê ve bîr pêkanîn û çî gava, ji der de, ji alî çanda serdest ve, destkarî li çandekê were kirin, wê gavê çilvirîna (degeneration) wê çandî dikeve behsê; û çanda destkarî lê hatî kirin, bi hêmanên ku ‘ne jê ne’ û dikevin nava wê, diçilvire; ji kan û sedemên xwe yê afirînê dûr dikeve û bi her qonaxê re jî hêmanên wê yê resen tîrî tune kirin û windakirin; helbet ne tenê hin hêman tîrî windakirin, di heman demê de civakek (û pê re jî takekes) bêbîr û bêdîrok tîrî hiştin. Wekî dongîya vê kurte-nirxandina xwe, em dikarin bêjin: Windakirina çandan û pê re jî bêbîrhêlan û bêdîrokhêlana takekes û neteweyan ne bi pêwendîyeke xwezayî ye; bi destkariya hêzekê pêk tê ku “Çand, bi demê re, bi awayekî êrîşkar, bi netewe an jî netewe-dewletê re tê bilêvkirin; û dibe kana zanavê (identity) û ‘em’ê ji ‘ew’ê cihê dike.” (Said, 1998: 4) Tundiya ku E. Said bi gotina ‘êrîşkar’ behs jê dike, kana sereke ya pêkanînên serdestiya mêtînger e. Serdestiya mêtîngerîyê, serweriya nirxên çandên xwe li civak û komên etnîkî yê bindest ferz dike û pê re jî çanda gelê bindest bîrîrx-bêqîmet dike. Ji ber ku çanda gelên bindest jî destkariyeke dîrokî ye li ser xwezayê û bi qonaxên dîrokê re hatiye afirandin û ji ber ku serdest tu serwerî li ser xwe qebûl nakin û “dixwazin çanda xwe di navenda jiyanê de bi cî bikin,” (Fromm, 1981: 48) mêtînger û desthilatên mêtîngerîyê her tim di nav hewldanê de ne ku destkariyê li çanda bindestan bikin. Ev destkariyên ku di her helûmercê de, bêtir bi rêya ziman tîrî pêkanîn, derbeke taybet li hiş û bîra mirovên bindest dixin û ji demekê û şûnde jiyar û ezmûnên wan “li bêjînga bîr û hişberiya wan nakevin; û dimînin di qada derhiş de” (Fromm, 1981:

54) û her ku diçe ‘jêdûrbûnek’, ‘hayjênebûnek’ û ‘neçalakiyek’ê ava dikin bi mirovê bindest yê maraştî re û wekî encama vê qonaxê berê takekesên bindest yê maraştî, bi alî lixwenebanbûnê ve diçe.

Ji ber ku ziman hêman û hilgireke (carrier) sereke ya çandê ye, mirovê bindest yê maraştî, bi gelek navgînên asîmîlasyonê; bi taybetî bi tundiya ku bi ‘kêmnirxkirina neteweyî û nîjadî’ tê meşandin, ji hebûna xwe, ji hêmanên hebûn(iy)a xwe sar dibe, jê dûr dikeve û piştî bihurîna di qonaxekê re, li çand û zimanê xwe neban dibe.

Çavkanî

- Botî, Kamêran (2007) Ferheng, Kurdî-Kurdî, Stenbol: Weşanên Do, çapa yekem.

- Bozarslan, M. Emin (2018) Ferhenga Kurdî, Stenbol: Weşanên Deng, cildê sêyemîn.

- Cassirer, Ernst (1980) İnsan Üstüne Bir Deneme, (Çev. Necla Arat), İstanbul: Remzi Kitabevi, 1. Basım.

- Farqînî, Zana (2004) Ferhenga Kurdî-Tirkî, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, çapa yekem.

- Fromm, Eric (1981) Psikanaliz ve Zen Budizm, (Çev. İlhan Güngören), İstanbul: Onur Basımevi, 1. baskı.

- Gasset, Ortega, Y., (1995) İnsan ve “Herkes”, (Çev. Neyire Gül Işık), İstanbul: Metis Yayınları, 1. Basım.

- Hegel, Georg, W. F., (1986) Tinin Fenomenolojisine İlişkin Temel Düşünceler, (Çev. Nejat Bozkurt), İstanbul: Remzi Kitabevi, birinci basım.

- Kiraz, Sibel (2011) ‘Yabancılaşmanın Kökeni Üstüne’, FLSF (Felsefe ve Sosyal Bilimler Dergisi), Güz, sayı 12.

- Marx, Karl (2007) Yabancılaşma: 1844 El Yazmaları, (Çev.

Kenan Somer, Ahmet Kardam), Ankara: Sol Yayınları.

- Said, Edward (1998) Kültür ve Emperyalizm, (Çev. Necmiye Alpay), İstanbul: Hil Yayınları.

- Schnapper, Dominique (2005) Sosyoloji Düşüncesinin Özünde Öteki ile İlişki, (Çev. Ayşegül Sönmezay), İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.

- Timuçin, Afşar (1992) ‘Yabancılaşma Sorununa Genel Bir Bakış’, Ankara: Felsefe Dünyası Dergisi, Türk Felsefe Derneği Yayını, sayı 5.

- Uygur, Nermi (2001) Kültür Kuramı, İstanbul: YKY Yayınları, birinci basım.

Ferhengoka Têgihî

Berhênan: manufacture, production, üretim

Ciyawaz-cihêwaz: discrete, different, farklı, ayrık

Demajo: proces, süreç

Derbar: regardind, about, dair

Dîke: Other, öteki

Hişber: conscious, bilinçli

Hişberî: consciousness, bilinç

Kirde: subject, özne

Marastî: exploited, sweated, sömürülen

Nebanbûn: alienation, yabancılaşma

Şêwe: style, form, biçim

Tiştê: object, nesne

Xwebûn(î): entity, self, kendilik

Zanav: identity, kimlik

Qaçaxê kurê Şebab

■ Berhevkin: raper ozeri

Qaçaxê mirad di sala 1914an de li bajarê Qersê yê Kurdistana Osmanî hatîye dinê. Temenê wî çar sal bûye ku leşkerê Osmanî yê şikestê Şerê Cîhanê yê Yekê, di sala 1918an de êrîşên hovîtî birin ser kurdên navçeya Qersê. Mala bavê wî berê xwe da Ermenîstanê û li navçeya Elegezê bi cih bû. Qaçaxê zarok bextê wî jê re yar bû, gelek li wê navçeyê nema û bar kirin û çûn bajarê Tiflîsê yê paytextê Gurcîstanê. Deh sal xwendina seretayî û amadeyî li Tiflîsê di xwendegêha rûsî ya hejmara 47an de temam kir. Vêca ji bo xwendegêha zanîngehê temam bike çû Êrîvanê, di destpêkê de li Êrîvanê sê salan bû xwendekarê Enstîtûya Ziman û Edeba Rûsî, piştî enstîtûya amadekirina mamosteyên zimanê kurdî di wî bajarî de temam kir. Piştî vê du salan li bajarê Lenînakanê yê Ermenîstanê mamosteyîya xwendegêha seretayî kirîye.

Di sala 1939an de Qaçax di Rêxistina Xortan a Lenîn de bû. Wê salê bû partîzan û dest bi perwerdeya şerê partîzanî kir. Di sala 1941an de ku Almanyayê êrîşê ser Rûsyayê kir, di şiyana wî de bû di enîya wan şeran de roleke mezin bileyze. Di beşekê zêde yê erdê Çekoslovakyayê de di nav rêzên leşker de bû. Di dagirkirina bajarê Berlînê de yek ji wan serbazan bû ku alaya Sivaştîkaya Almanya Nazî ber bi jêr kir. Piştî şer Qaçax heta sala 1958an di rêzên Leşkerê Sor yê Rûsyayê de ma. Wê salê midetê sal û nîvekê di beşê kurdî yê Radyoya Êrîvanê de xebitî. Di sala 1959an de guheştin ji bo rojnameya Rya teze û bû endamê desteya nivîskaran. Nav navan re dibû sernivîskar, ji ber ku endamên desteya nivîskaran ên rojnameyê yek li pey yekê her yek jê ji bo midetekê dibûn sernivîskar, bi vî awayî Qaçax di vê rojnameyê de kar kir û heta dema xanenişînê û dawîya jiyana xwe.

Qaçax di şer de du caran birîndar bûye, şeş madalye wergirtine, bilindtirînê wan madalyaya “Stêrka Sor” e. Ji ber wê sebebê midetê zêde ya jiyana xwe bi rojnamegerîyê re mijûl bûye, peywendîya wî bi çap û weşanê ve bi hêz bûye. Di amadekirina kitêbên hevrêyên xwe de ji bo çapê, di warê nivîsandina pêşgotin û redakteyê de gelek alîkarîya wan kirîye. Hewl û xebata Qaçax di hinek nivîsên Semendê Siyabendov, Mikaêlê Reşîd, Hecîyê Cindî, Karlênê Çaçan û hwd de diyar e. Zanîna kurdî, rûsî, ermenkî, gurgî û azerî bi xwendin û nivîsandin, alîkarîya wî kirine ku di hemî kar û barên xwendewarîyê de bi serketî be.

Piştî jiyaneka tijî ji xizmeta rewşenbîrî û dahênana edebî, Qaçax dewlemendîyeke rengîn û bi feyde ji bo neteweyê xwe di cih de hişt ku di sala 1992an de li bajarê Êrîvanê koça dawîyê kir.

ŞIIRÊN WÎ

Qaçax ji zaroktîya xwe ve hogirê edeba millî ya devkî ya dewlemend a kurdî bûye. Xwendina nû û dîtina bajarên mezin û zanîna gelek zimanan, zemîn jê re xweş kirin ku ji bo pêşxistina edeba kurdî ya nû li welatê Qafqasya Rûsyayê ji dayîk bûbû roleke giring bileyze. Hemî şîirên wî li ser kêşa hêceyî ya xwemalî ya kêşa dirêj in, kêşe piranîya hêceyan kert dike. Di qafîyeyê de şareza ye. Bi giştî şîirên wî di warê qafîyeyê de li ser destûra “şîira nû” dimeşe, yanî qafîye gelek renga û reng in. Qaçax hewil daye ji bo rewanî, ritm û ahengê şîirê li ser bingehe yekîtiya qafîyeyê dane. Ev ji alîyê wî ve ji biyanîyan nehatîye wergirtin belko dahênana wî bi xwe ye.

Yek ji karakterê giring yê şîira Qaçax ew e ku hewil daye zimanê şîirê dewlemend bike, bi vê gelek bêjeyên ferhengê û termên peywendîya wan bi pêşesazîyê ve hene anîne nav şîirê. Bi vê hinek ew şîirên nivîsandî yên bi qîmet ji şîira millî ya devkî dûr xistine û bi vî awayî bêhna medenîyetê ji şîira wî tê. Ev ji bilî gelek termên nû bikar anîye, ku peywendîya wan bi jiyana sosyalîzma wê serdemê ve hebûye ku kurdên Qfasyayê tê de jiyane.

Şîira Qaçax bi giştî ji mijara lîrîk û poyemê ne. Lîrîkên wî di warê hejmara rêzan de kurt û dirêj tê de hene. Herçî poyemên wî ne jî dirêj in. Bi naverok hinek jê ji edebîyata millî ya devkî hatine wergirtin, lê şair huner daye nîşan û berhemeke nû ava kirîye. Beşek din van poyeman ji dahênana şair bi xwe ne û piranîya wan ji jiyana kurdî hatine wergirtin. Ji poyemên sipehî û rengîn navê van dikevin ber çav: Çîrokên Mîrza Mihemed (1936); Leylê (1948); Qadirê Nêçîrvan (1960); Kilama Êgrîdaxê (Agri Daxi) (1962); Gelîyê Elî Beg (1965).

Li ser wê çîroka navê wê Gelîyê Elî Begê Kaçax dibêje: Di sala 1961an de ku Şoreşa Îlonê ya Kurdistana Iraqê dest pê kir pêşî wekî kurdekî, vêca wekî rojnamenivîsekî rojane ez evdalê wê bûm nûçe, agahî û bûyerên şoreşê seh bikim, piştî ew nûçe bûn îlham û ev şîir ji dayîk bû.

Di warê naverokê de şîira Kaçax hemî milekî jiyana kurdên wî welatî girtîye. Bi giştî hemî ji hêlm û nefeseke geşbînî zayîne û ji reşbînîyê dûr in. Parêzgarî bi ûrf û adet û exlaqê kurdî girtîye. Soza li hemberê îdeolojîya sosyalîzmê kûr e, rizgarîya kurdan di wê de dîtîye. Qaçax yek ji xwendewarê diyar ê kurd ê bi manaya entelektûelîya ewropî ye, lê li gel wê jî kurdîtîyê wenda nekirîye.

NIMÛNEYÊN ŞIIRA WÎ

Qaçax di lîrîkekê de wiha dibêje:

Wexta ez te dikim gazî

Hezar dengî û avazî

Ez sotim avirê nazi

Nizanim diha çi dexwezî?

Xewta ez bûm teyrê bazî

Tu ku votka gerden gazî

Pey te firîm bi perwazî

Bê feyde ye çi dexwezî

Ser te da tîm bi dilsazî

Lê tu min ra nabî razî

Ev bû nolanî canbazî

Nizanim diha çi dexwezî

Şair bi van bêjeyên sade û gelek bi liv ji dilberê hîvê lava dike, ecêbmayî maye nizane ew nazenîn çi jê dixwaze, bi hemî awayî dixwaze razî bike, dixwaze bizane bi çi razî dibe. Ew nehînî ne, her ew nehênîye jî bûye sebebê sipehîtiya şîirê. Ji bilî vê yekîtiya qafiyeyê cure sipehîtiyekê di warê rewanbêjî, rîtm û mûsîqayê ve daye lîrîkê.

Li ser destûra berê lîrîkekê ji bo gul û insên hûnandîye:

Tûmê gulê ev sitirîne

Lê gulê ra dibêjin gul

Gul ku teze pişkivîne

Hemin wan re dibêjin gul

Hin ew sor in, hin spî ne
 Dîsa wan ra dibêjin gul
 Bîna xweş meriv hiltîne
 Hema ji bînê dibêjin gul
 Wexta belg lê xeyrî ne
 Jê ra dîsa dibêjin gul
 Çimkî şûret lê gulî ne
 Lema jê ra dibêjin gul
 Lê tu meriv bidûmîne
 Ku te ra jî bêjin meriv
 Hurmet, siyanetê dest bîne
 Ku te ra tim bêjin meriv
 Şûreta xwe neyêxîne
 Ku te ra tim bêjin meriv
 ‘Emr boy weten nehêvjîne
 Ku her dera bêjin meriv
 Mervî, meriv bimîne
 Ku bi ku bar bêjin meriv

Şair mijûlê miqayeseyê ye, di warê carîkirina “gul” û “meriv”ê
 vê şîirê de ji babetê awazê ve, di wê de yekîtîya qafiyeyê bikar tîne.
 Di manayê de sifetên sipehî yên gulê dibijêre, çi sifetê têke rexê wê
 her gul e, ji bo insên jî tenê sifeta başîyê hildibijêre, yanî çi kesê
 xwedîyê wê sifeta baş be mirov e, eger nebe ne mirov e.

Di lîrîkekê de şair behsa “bihayê şîrê/qelen” ya di nav civata
 kurdî de dike

Hey qelen, qelen urit te biquele
 Çi milletê kurd bûyî teşqele
 Çiqas qîzêd can çi xortê telîyan
 Miraz çevda man tu bayisê wan
 Çiqas dilê geş xort û qîzêd neder
 Hevûdu hebandin bi hev sewdaser
 Evîntî li wan nolê Mem û Zîn
 Tu Bekoyê wan mexenetî kîn
 Bes e, lo qelen, urit te biquele
 Çi bûyî bela, bûyî teşqele

Şair di vê lîrîkê de li dijî pereyê şîrê (qelen) sekinîye, ev yek ji pîrsgirêka herî giring a kurdewarî ya wî welatî bû. Nivîskar û şairan bi şîir, çîrok, roman û dramayên şanoyê dijîtiya vê ûrf û adetê paşvemayî ya civatê kirine. Ji ber ku wê rewşa maddî heta derecekê serûbin kirîye, niha qelen ewqas zêde nemaye, lê kesên wisan hebûn vê exlaqekî baş hesêb dikirin û wekî ûrf û adeteke neteweyî ya taybetî ya kurdan lê dinêriyan, ji ber wê bû xwendewaran hewil didan xelkê tê bigihînin ku qelen adeteke paşvemayî ye û pêwîst e ji bîngeh ve bê rakirin, ji ber ku keç insan e û insan jî nayê firotin.

Qaçax ji bo koça dawîyê ya nivîskar û şair Wezîrê Nadîrî wiha dibêje:

Bin şûşê da danyê şîklê wî ber min
 Xudaneke sar daketye li ser min
 Ew dîkene ez mirûz im seba wî
 Min dipirse ez nadimê caba wî
 Berê da em bira bûn dil helal

Nolê şirkê avê ji kanya zelal
 Ez sond dixwim vira li ser şiklê te
 Ji hurîya çetr kenê heru ‘eqlî te
 Bi evînt weten hiz kin ji vêna te
 Mi be serkin em her cara nêta te

Kuşîna şair û nivîskar Wezîrê Nadîrî ya di sala 1946an de ji alîyê dijminê desthilata Sovyetê û neyarê kurdan ve di nav kurdên Qafqasya Rûsyayê de bûyereka giring bû. Tesîreke mezin kiribû li ser dil û hinava xelkê. Qaçax hevrêyê dilsoz ê Wezîr bû, di vê lîrîka xemînîyê de evîntîya biratîyê ji nav hinava wî diherike û ji Wezîr re neqil dike û naçar bûye li gel wêneyê gotûbêj bike û jê re bilorîne.

Di şîireka navê wê “Klîma Îgrîdaxê” de Qaçax wiha dibêjê:

Delo, lo, lo , lo, lo, lo wayê, li min wayê
 Îsal heft salê teşkîleta kurdan e
 Li bereka Îgrîdaxê ne tê kuştin, ne tê rayê
 Dinê, mêr dizanin nav, dengî Birahîmê çê
 Ferzende Hesên Nûrî – Şêx Zahir
 Bela bûye dozde qralê ecnebî li dinyayê
 Gelo me nizanibû şert – şûretê
 Dewleta Romê wê li me ha be
 Em ê cabekê bidenê, bila êla kurda
 Li Enadolîyê rabe
 Heyfa min tê bereka Îgrîdaxê
 Li teşkîleta kurda, nalîyêd ‘eşîra
 Na wella dîsa bavê ‘Edo, kekê Memê

Ne li nav e
Dilê min tu dilî nehebîne
Dora koçka kekê ‘Edo Gulê bîne
Heyfa min tê bereka Îgrîdaxê
Li teşkîleta kurda, li alîyêd ‘eşîra
Na wella dîsa kekê ‘Edo
Ev tu nîn e

Klama Îgrîdaxê poyemek e ji zêdetirî dused rêz şîir pêk hatîye. Qaçax di sibata sala 1962an de li Êrîvanê hûnandîye. Çîroka şîirê behsa şoreşa kurd a di sala 1930an a di bin fermandeya Îhsan Nûrî Paşa de dike. Tirkên Kemalîst bi agir û hesin gelek kes kuştin, zêde kes koçber bûn, serekê şoreşê pena bir ber Îranê û li wir bû penaberê siyasî.

Ev peçeşîir pêşgotina poyemê ye. Dahênana şîira Qaçax di wê de ye, ev pêşgotin li ser destûra “lawik”ên bakurê Kurdiştanê û “heyran”ên başûrê Kurdiştanê hatîye danîn. Di xwendinê de bi êşkere diyar e wekî tu bêjî gundîyekî millî yê nexwendawar vê lawikê hûnandîye, lê ji naveroka wê ev derdikeve ku xwedîyê wê rewşenbîrekî zana û xwedî şîyan e. Mebesta şair ji Hesên Nûrî, Îhsan Nûrî Paşa ye. Îbrahîm û Şêx Zahir dibê yaverên Îhsan Nûrî yan cengawerên şoreşê bin. Her wiha navê ‘Edo û Memo derbas bûne, bêguman ev jî cengawerên şoreşê ne. Enadol jî navê coxrafya beşê Asyayê yê Tirkîyê ye, bakurê Kurdiştanê hemî di wî beşî de ye.

Qaçaxê Mirad, şairekî rind û rewşenbîrekî berçav û rojnamenivîsekî zîrek bûye. Midetekî zêde jiyana xwendewarîyê di rojnameya Rya teze de derbas kirîye. Yek ji wan şairan e di şîirê de

beşdarî di avakirina şîira nav civata kurdî ya Qafqasya Rûsyayê de kirîye. Di pêş de xwedîyê meşqa şîira millî bûye, şîirê ji folklorê cihê nekirîye. Lê piştî şîira kurdî gihandîye wê sevîyeyê ku di pêşerojê de dibin klasîk, bi manaya şîirê sevîya bilind a çîna xwendewar. Qaçax di şîirê de hemî kêşên xwemalî bikar anîye, di qafîyeyê de dewlemend e û di rewanbêjîyê de xwedîyê rêbaza xwe ya taybetî ye. Îstîfade ji hemî ew neteweyên zimanê wan zanîye wergirtîye.

**Mîr Celadet
Bedirxan. Mîrê Ziman û
Alfabeya Kurdî**

 Konê Reş

Gelên xelkê xwe bi mirovên xwe, yên şareze, zane û mêrxas pesin û paye dikin. Ewên ku gelên wan sûdeyek ji wan dîtibin, çi di warê hilgirtina tivingê de û çi di warê hilgirtina pênuş û xamê de. Lê mixabin em gelê kurd di vî warî de jî paşketî mane. Bêguman sedemên vê yekê jî pir in. Qey ev jî Qedera me kurda ye?

Di roja 26ê Gulana 2023an de, (130) sal di ser rojbûna rêberê zimanê kurdî, Mîr Celadet Bedirxan re derbas dibe. Gelo kesî gotiye emê vê roja p'roz bi bîr bînin an haziriya xwe û vê rojê bikin? Tevî ku bêtir ji 10 navendên kulturî û çandî yên kurdan, di van salên dawî de, çi li welat û çi li derveyê welat be hatine dameziran. Roja îro dor 20-30 kovar û rojname hene ku bi wê alfabeya ku wî ji zimanê kurdî re bijartîye têne weşandin. Ew alfabeya ku 13 salan pêre dirêj kir û bi wê alfabeyê di Gulana 1932an de hawar û gazî li kurdan kir û got:

Bavo li dinê ji me kêmtir kes nemaye, heçî millet hene tevde bûne dewlet û hikûmet, xwedan kitêb û dibistan. Bi tenê em milletê kurd bi şûnde mane, reben, feqîr, nezan, belengaz di destê xelkê de lihîstok. Xelkê hevsarê me kiriye destê xwe li gor kêf û menfieta xwe, berê me ji bakur dide nîvro, ji rojave dide rojhilat, ji lewra divêt em jî bixebitin, xelkê xwe hînî xwendin û nivîsandinê bikin, vî milletê belengaz ji tariyê xelas bikin, berê wî bidin tav û ronahiyê. (1)

Mîr Celadet yê ku li ser rêk û şopa apê xwe (Mîr Miqdad Medhet Bedirxan) diliviya, hawar û gaziya wî ji ya apê wî bû. Ew apê ku di roja 22ê Nîsana 1898an de, anku ji berî 125 salan ve, yekemîn Rojnameya kurdî li Qahîre bi navê “KURDISTAN” weşandiye, di nav kurdan de belav kiriye û gotiye:

Gelî mîr û axano, kurmancino! Qenc bizanin, xwendin, ilm û marifet li dinya û axretê rûyê mirov sipî dike. Niho zaroyên xwe bi elîmînin ilm û marifetê. Hûn bi xulaqeta xwe şûcah û cesûrin. Hekê hûn bibin xweyî ilm, hûnê ji dinê hemiya xurttir, dewlemendtir bin. (2)

Ma negereke ku ev navendên çandî, kovar û rojnameyên kurdî, li dor jiyan û ramanên wî kesî rawestînin, nav û nîşanên wî di nav gelê wî de belav bikin, da ku xelkên wî, ji nêzîk ve, wî nas bikin, serwestî xebat û berhemên wî bibin, navê wî ji tariya salan derkeve ronahîya rojên îro.

Di baweriya min de, yê ku li kevnê xwe nepirse û neparêze, zore ku karibe di pêşerojê de, tiştekî durist û aktîv ji gelê xwe re pêşkêş bike. Vêca gereke em guhdariyê li vê yekê bikin, li wan mirovan miqate bin û gelê xwe serwestî jiyan û xebata wan bikin. Fermo bi kurtebirî jiyan û xebata Mir Celadet Bedirxan.

Tevî ku mirê dûmahîya welatê Botan, Mir Bedirxanê Azîzî sala 1868an, di sirgunê de li Şamê, çûye ber rehma Xwedê, lê siltanê Osmanî rê neda kurên wî bi vegera warê bav û kalan “Cizîra Botan”. Pira-niya kurên wî kirin hakim, walî û paşa, lê li derveyî welatê wan, da ku ji şer û bela wan xelas be.

Hingê, Mîr Emin Alî, bavê Celadet, kurek ji wan kuran bû, para wî hakimiya cezayê bû li Stanbolê. Di roja 26ê Nisana 1893an de Xwedê kurekî didêyê, navê wî dike “Celadet”, bi wateya sebir û samanê. Ji ber ku bi hêvî bû rojekê vegere welatê xwe Botan. Vêca sebir û saman dikişand. Lê mixabin, ew hêviyên wî di sala 1926an de, li Misrê, bajarê Qahîreyê, pê re çûne gorê.

Di nav salan de, kurê wî Celadet, ew hêviyên bav û bapîrên xwe, bi xwe re hilgirtin û hilanîn û di ber wan de xebitî ta roja dawî ji temenê xwe. Mîr Celadet bi bav, ap, pismam, bira û welatparêzên kurdan re beşdarî di avakirina komeleyên kurdî yên pêşî de li Stenbolê kir. Di sala 1914an de, beşdarî di şerê cîhanî yê yekemîn de li eniya Qefqasê kir, ta ku di Tebrîz û Bakoyê de derket.

Di sala 1919an de, digel birayê xwe Dr. Kamîran, Ekremê Cemîl paşa û Fayîq Tewfîq ji Silêmaniyê (Pîremerd), bi mêcer Newêl yê inglîzî re li bakurî Kurdistanê geriya, da ku daxwazên gelê kurd berî morkirina peymana Sîverê, di navbeva hevalbendan û dewleta Osmanî de nas bikin. Di sala 1922-1923an de Mîstefa Kemal paşa fermanek bi kuştin û sirgunkirina malbata Bedirxaniyan û welatparêzên kurdan deranî, vêca ji neçarî wana tirkîye li şûn xwe hiştin û bi şar û welatên dinyê ketin. Hingî, Celadet û van birayên xwe: Kamîran, Tewfîq û Sefder di Almanîya re derketin, bavê wî Emîn Alî Bedirxan û birayê wî yê mezin (Sureya Bedirxan: Dr. Bileç Şêrko) di Misrê, bajare Qahire re derketin.

Mîr Celadet li Almanya, xwendina xwe di parêzeriyê de bir serî û dest bi xwendina doktorayê kir. Lê dema ku şoreşa şêx Saîdê Pîranî di sala 1925an de destpê kir, xwendina xwe li rexekî hişt û xwe bi şoreşê ve gîhand. Mixabin ew şoreş ne di çax û demê xwe de destpê kiribû û dawî bi hovîtî hat perçiqandin. Mîr Celadet jî, polîpoşman careke din zîvirî Almanîya ku xwendina xwe di doktorayê de bibe serî. Lê nexweşî û mirina bavê wî li Qahîreyê di sala 1926an de, ew derfet nedayê..

Di sala 1927an de Mîr Celadet û Memdûh Selim Beg Wanlî, bi alîkariya ermenan û beşdariya gelek welatparêz û serokên eşîran komeleya” Xoybûn” li Libnanê damezirandin. Di sala 1929-1930yî de, endamên komeleya” Xoybûn” li Sûriyê xwe ji alîkariya şoreşa Agrî re amade kirin, ku ji sînore Sûriyê ve êrîşî tirkan bikin û bavêjin ser Mêrdînê, Midyadê, Êrfa û Cizîrê, da ku akama artêşa tirkan ji ser şoreşvanên Agrî si-vik bibe. Lê sed mixabin wek ku Mîr Celadet û hevalên xwe dixwestin bi wan re neçû serî. Ji ber nakokîya axa û begên Binxetê û nerazîbûna wan ji hev. Vêca Mîr Celadet ji neçarî, wî û çend hevalan xwe bi şoreşa Agrî ve gîhandin, da ku li kêleka Îhsan Nûrî Paşa, Îbrahîm Hesko Têlî û hevalên wan bin.

Lê sed heyf û mixabin, ew şoreş jî, bi hovîtî û tundî hat qurmican-din, serokên wê jî, ji neçarî xwe li îranê girtin û Mîr Celadet Bedirxan di gel wan. Li Tehranê, Mîr Celadet ji şah Riza Pehlewî alîkarî xwest, lê şah Riza xwe neda ber tiştêkî, tiştê ku xwe da ber, ji Mîr Celadet xwest ku bibe şalyarekî Îranî li dewleteke Ewropî. Mîr Celadet bi vê pêşniyara wî razî nebû. Vêca Riza Pehlewî ew bi darê zorê ji tixûbên Îranê derbasî Îraqê kir. Li Îraqê, hikumeta ingilîzî şerê kurdan dikir, dema sehkir ku mîr Celadet li Bexdayê ye, rêtenge jêre çekirin. Ji ber ku Mîr wek semboleke netewî ya kurdan bû. Û dawî Mîr ji neçarî, ji Îraqê derket û vegeriya Sûriyê/ Şamê. Li Sûriyê hikûmeta firansî, ew û hevalên wî kirin bin rûniştina zorê de.

Di roja 16ê Nîsana 1929an de, Mîr Celadet Alî Bedirxan dibe yak ji endamên Sendîkaya Parêzerên Beyrûtê. Hingê Sûriye û Libnan di bin desthilatiya Fezansîzan de wek yek dewletê bûn.

Di sala 1931ê de Mîr Celadet bi serokên êl û eşîrên kurdan re, komelayek bi navê “Civata alîkariyê ji bona kurdên belengaz li Cizîrê” damezirand. Ji bona alîkariya wan kurdên ku ji tirkîyê mişextî û sirgunî binxetê bibûn.

Di sala 1931ê de jî, Mîr destûra kovara xwe HAWARê, bi zimanê kurdî tîpên latînî ji hikumeta Fransîzî di Sûriyê de distîne û di roja 15/5/1932an de hejmara pêşî ji kovara xwe Hawarê li Şamê çap dike û di nav kurd û biyaniyan de belav dike. Di rûpelên wê de hawar û gazî li kurdan dike û dibêje:

Hawara me berê her tiştî heyîna zimanê me dê bide naskirin lewma ku ziman şerta heyînê ya pêşîn e. (3)

Û di kovara Hawarê, hejmara 27/1941ê de wiha dibêje:

Kuro eyb e, şerme, fihête, an hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe bibin, an mebejin em Kurd in. Bê ziman Kurdîti ji we ra ne romete, ji me ra rûreşîyeke giran e. Heyf û xebînet û hezar mixabin, nemaze ji wan ra ko bi zimanên din dizanin bixwînin û binivîsînin û alfabeya zimanê xwe hêj nas nakin.

Ew cara pêşîye ku alfabeya kurdî latînî berdestî zimanê Kurdî dibe. Di gel kovara “HAWAR”ê, di roja 1/4/1942an de, mîr Celadet kovareke din bi navê “Ronahî” xwerû bi kurdîya latînî çap û belav dike. Ji ber nebûna nivîskaran, Mîr Celadet bi bêtîrî “15” navan di van herdû kovarên xwe de dinivîsîne. Nedixwest ku biyanî zanibin ku bi tenê ew û birayê xwe (Dr. Kamîran) tev babetên van kovaran dinivîsînin. Paşê Mîr di nav gelek kesan de, ew dehif dan ber nivîsandina bi zimanê kurdî. Di roja îro de gelek ji wan nav û deng dane wek: Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can, Mîstefa Ehmed Botî, Hesên Hîşyar... Hingê jî, gelek kesên bi nav û deng di kovarên wî de nivîsandine wek: Goran, Bêkes –Ihsan Nûrî Paşa, Evdulrehmanê Eliyê Ênis, mele Ehmed Nami û hwd.

Mîr Celadet, di ber çapkirina herdû kovarên xwe re pirtûkxaneyek bi navê Pirtûkxana Hawarê vedike û bi navê wê pirtûkxaneyê 20 pirtûk çap dikin, diwana Cegerxwîn a yekemîn: Pirîsk û Pêt “ yek ji wa ye. Hem jî Mîr Celadet pêşgotina vê diwana Cegerxwîn dinivîsîne.

Di sala 1935an de bi dotmama xwe “Rewşen xanim Bedirxan” re dizewice. Ji zewaca wan kur û keçek li wan zêde bûye, kur navî wî “Cemşîd” e di sala 1939an de çêbûye, doktor bû di bijîşkiyê de, jiyana xwe li Almaniya derbas dikir, di sala 1999an de li Brazîl çûye ber dîlovaniya Xwedê. Lê keça wî navê wê Sînemxan e, kebanîya nivîskarê kurd ê rehmetî Selah Saadella ye, niha li Hewlêrê dimîne. Mîr Celadet bi van zimanan zanîbû: tirkî – inglîzî – fîransî – farisî –rûsî-yûnanî- almanî-erebî û zimanê kurdî, zimanê axaftinê bû li mala wî.

Eger mirov li dîroka malbata Bedirxaniyan vegere û berpêl bike, wê bibîne ku piraniya Bedirxanî di sirgûn û zîvariyan de mirine û hatine kuştin û ev yek bi tena sere xwe xweş nîşane ji dilsozî û wefadariya wan re. Pêwîste em navê wan bi tîpên zêrîn di dîroka gelê xwe de bini-vîsin. Sed rehmet li giyanê tev referên malbata Bedirxaniyan bibare, bihûşt cih û warê wan be.

Di roja 15/7/1951ê de, dema ku Mîr Celadet Bedirxan li gundê Hêcanê, nêzîkî Şamê çûye ber dilovaniya Xwedê hevalê wî Qedrî Can, ev gotin li ser kêla ber serê wî nivîsandine:

Mîrê kurd lawê Kurdistan
Neviyê Bedirxan
CELADET
Fidakar xwediyê himet
Cendekê ku di vir de binax bû
Giyanê wî bilindî asman bû
Di riya neştiman
Xwedî bican
Giyanê xwe kir qurban
Nemirîye, zindîye
Navê wî ebedîye.
15/07/1951

- Ji berhem û afirandinên mîr Celadet Bedirxan:
- 1-Rêzimana alfabêya kurdî, Şam 1932.
 - 2-Rûpelinine alfabê, Şam 1932.
 - 3-Bîyîsa Pêxember, Şam 1933.
 - 4-Nevêjên Êzdiyan, Şam 1933.

5-Nameyek ji Mistefa Kemal Paşa re, Şam 1934.

6-Li dordoza Kurdistanê, Misir 1943.

7-Giramêra kurdî, Şam 1943.

8-Giramêra kurdî-bi firansî

9-Sebebên raştîyî ketina edivne

10-Ferhenga kurdî –kurdî

11-Ferhenga kurdî-firansî

12-Xwebinas

13-Kitêba sînemxanê

14-Hevind (şano ye)

15-Dîwanek helbest, (çapnebûyî)

Jêder:

1- Mîr Celadet Bedirxan, kovara “Roja Nû” jimar “1” Beyrût, 1943

2- Mîr Miqdad Medhet Bedirxan, rojnameya “Kurdistan” jimar 4 Qahîre 1898.

3- Mîr Celadet Bedirxan, Hawar, jimar 1.Şam 1932.

dereqa Qaçaxê Mirad da

■ Emerîkê Serdar

Navê dêmekî lîteratûra kurdaye sovêtiyê naskirî, şayîr, jûrnalîstekî kurdî eyan, t'evgelekî Şerê Wetenîyê mezin Qaçaxê Şevavê Mirad zûva xwendevanê kurdra nase.

Qaçaxê Mirad meha dêkabrê sala 1914-a gundê Tendûrekê, neh'ya Sînekê (qeza Qersê) ji dya xwe bûye. Qaçaxê çar salî bû, gava ber zulm û zêrandina Romê mala wan jî mecbûr dibe dide ser rê-dirbê nenas. Sifte têne Ermenîstanê, paşê diçine Gurcîstanê. Hema vêderê jî bavê wî diçe rehmetê û temamya qaranya malê dikeve stûê brê wîyî mezin – Osê. Qaçaxê biç'ûk jî hindava xwedaMin çî dît-2 k'omêk dida brê, diçû ber dêwêr. Ew gund, ku mala wan têda sit'ar bûbû, gundê ûrisa bû. Hema vî gundîda jî Qaçax diçe mektebê. Paşê, gava mala wan tê Tbilîsîê, ew diçe wê mekteba kurda, ku Lazo serkarî lê dikir. Paşê kutakirina wê ew usa jî mekteba ûrisaye ort'eye N 4 xilaz dike, tê Yêrêvanê û têxnîkûma kurdaye Pişkavkazêye dersdarîêda tê qebûlkirinê. Lê zûtîrekê ew vê têxnîkûmê dertê û dikeve înstîtûta ûrisaye pêdagogîyêye dusale.

Sala 1937-a Qaçaxê Mirad înstîtûtê kuta dike û weke du sala bajarê Lênînanêda dersdarîê dike.

Sala 1939-a Qaçaxê Mirad diçe eskerîê û weke 20 salî cêrgê Ordya Sovêtiêda qulix dike. Salê Şerê Wetenîyê mezinda Qaçaxê Mirad sîlih' dêstîda bi efatî wetenê meyî sovêtiê xwey dike, ji çend cîya birîndar dibe, lê dîsa vedigere pêşe'nîê. Bona efatya wextê Şerê Wetenîyê mezin ew bi du ordênêd "Steyrka sor"-va, 9 mêdalava tê rewakirinê.

Paşî bi altindarî kutabûna şêr jî Qaçaxê Mirad cêrgêd Ordya Sovêtiêda qulix dike, gelek xebatê cabdar dike, digihîje r'ut'bê kapîtan.

Qaçaxê Mirad weke du sala rêdaksîa xeberdanêd radîoêye kurdîda xebitye. Sala 1960-da ew rojnema "Rya teze"-da dixebite, pêşîê çawa katibê cabdar, paşê, hetanî mirina xwe, çawa dewsgirtîê rêdaktor.

Qaçaxê Mirad usa jî înstîtûta Yêrêvanêye pêdagogîyêye dûreke kuta kirye (sala 1966-a) û xwendina bilind stendye. Sala 1973-74-ye xwendinêda ewî p'ara kurdzanîêda ya fakûltêta ûnîvêrsîtêta Yêrêvanêye

dewletêye rohilatzaniêda dersê lîteratûra kurdaye klasîk daye.

Qaçaxê Mirad ji sala 1945-da uzvê Partîa komûnîstîye T'faqa Sovêtîê bû. Ew usa jî uzvê T'faqa nivîskarê T'R'SS û T'faqa jûrnalistêd T'R'SS bû. Sê cara bi hurmetnema Sedrtya Sovêta Rêspûblîka Sovêtîe-ye Sosîalîstîye Ermenîstanêye tewrebilind hatye rewakirinê.

Qaçaxê Mirad 4-ê dêkabrê sala 1979-a paşî nexweşya giran bajarê Yêrêvanêda wefat bû.

* *

Şiêra Qaçaxê Mirade pêşin sala 1935-a rojnema "Rya teze"-da neşir bûye. Lê du sala şûnda bi tercma wî serhatya Lêv Tolstoye eyan "Dîlê Kavkazê" bi kitêbeke başqe ronkayî dîtye. 4 berevokê efrandinê wîye xwexwetîê bi zimanê kurdî ronkayî dîtine: "Şewq" (sala 1958-a), "Gulperî" (sala 1962-a), "Bahara teze" (sala 1965-a) û "Gava çara" (sala 1972-a). Xênji wê, poêma wîye "Mîrze Meh'mûd" sala 1956-a bi tercma zimanê gurkî bi kitêbeke başqe ronkayî dîtye. Xênji hazirkirina berevoka "Efrandinê nivîskarêd kurdaye sovêtîê" (bi zimanê kurdî, sala 1961-ê), ku Qaçaxê Mirad û Casimê Celîl tevayî hazirkirine, ewî usa jî berevoka "Rya teze" hazir kirye, ku sala 1958-a bi zimanê ûrisî Tbilîsîêda ronkayî dîtye. Vê berevokêda hîmlî efrandinê efrandkarê kurdê Gurcîstana Sovêtîê neşir bûne. Ewî usa jî "Konstîtûsîa T'R'SS" tercmeyî zimanê kurdî kirye û sala 1959-a bi kitêbeke başqe daye neşirkirinê.

14 sala zêdetire, wekî şagirtê mektebê gundêd kurdaye k'omê VII-VIII bi wê kitêba dursa ("Lîteratûra wetenîê") hînî lîteratûra kurdî dibin, ku Mîroê Esed û Qaçaxê Mirad tevayî hazir kirine. Qîmetekî vê kitêbêyî mezin jî ewe, wekî cem me cara ewlin efrandinêd klasîkêd me bûne qnyatêd dursa.

Goveka têmatîka efrandinê şayîr gelekî fireye. Ew derheqa emrê vê p'ara cimeta kurdaye îroyîne bextewarda dinivîse, edlayê dipesine, şêr

û şerbaza gunekar dike, şerkarya cimetêd zêrandîye milletî-azadarîe dipesine. Hilbet, şîerêd bi motîva evîntî û derheqa tebyetêda jî kêmnînin.

Şayîr bengzê gundê meyî îroyînra şa dibe, gund, ku bi nav û nîşanê xweye îroyînva bûye şe’detnema bextewarya gundî me (“T’ewşê gundê me”), pesnê qîza kurdaye dewra sovêtî dide, ku bi fe’mdarî, berbirîbûn û dinênaskirina xweva hatye guhaştinê, bûye çekirçîke komûnîzmêye aktîv (“Jinêd welatê Şêwrêra”, “Keç’a kurda”, “Leylê”, “Meyane” û yêd mayîn).

Têma şêr û edlayê nava poêzîa Qaçaxê Miradda cîkî berbiç’ev digre. Şayîr te’lî û tengasya şêr dîtye, zane ew zulmeke çawane, lema jî bi dengekî bilind gazî cimetê dinyae dike, ku edlayê xweykin, nehêlin şêr pêşda bê.

Çawa t’evgelekî Şerê Wetenîeyî mezin Qaçaxê Mirad çend şîer û poêm pêşkêşî hevalê xweye şervanî kirine, yêd ku şerê giranda emrê xwe dane ruhîna weten, pêşkêşî wan heval-hogirê xwe kirine, yêd ku bi altindarî vegeryane malê. Vê derecêda berbiç’evin poêma wîye “Teyar” û “Raştatîna Rûstavî”. Merî dikare bi cumlekê serecema poêma pêşin bêje: kurê kurdayî mêrxas Teyar şêrda bona azakirina qîza qazax emrê xwe nahêvşîne, lê dilê wê qîzê û pîredêda hetanî-hetayê dimîne. Heq jî usane. Wetenê meyî sovêtîêda hemû cimet brane, rojê ox’irmê giranda pişta hev sekinîne.

Çawa vê poêmêda, usa jî ya “Raştatîna Rûstavî”-da h’esîna mala cimetê T’faqa Sovêtîeye yektî, îdêaêd dostî, bratya wan, e’fatya wekîlê ûrisa, ermenya, gurca û cimetê mayîn hatine dîharkirinê.

Qaçaxê Mirad êpêce şîer û poêm pêşkêşî şerkarya kurdaye milletî-dêموکراتî kirine, ew şerkarya heq pesinandye. Efrandinê bi vê têmaê nivîsî alavîne, germ û gur’in.

Evîntî û tebyet – du motîvêd poêzîa Qaçaxê Mirade hîmlîne. Evîntî jî her tiştî zêdetire, bîna ber ruhê şayîre. Temamya nazikayî û bedewya

tebyetê tê ber ç'evê xwendevana, gava efrandinê şayîre bi wê têmaê nivîsî dixûne.

Bahar xewê rabû,
Belgê darê şîne,
Gula nazik vebû,
Şayê xwera tîne.

Qelîbotk nava efrandinê Qaçaxê Miradda cîkî berbiç'ev digrin. Wan qelîbotkada ew çawa kêmasîê merya, xeysetê wan, usa jî edetê kevne zyandar krîtîk dike.

Raştîê jî qelen cimeta me bûye t'êşqe. Û Qaçaxê Mirad derheqa vê yekêda giliê xwe gotye, ew gunekar kirye:

Hey qelen, qelen, ûrt' te biqe –
Çi mîletê kurd bûyî t'êşqe...
Çiqas qîzêd can, çi xortê talyan –
Miraz ç'evda man, tu bayîsê wan.

Qaçaxê Mirad bi cûrê qerf-qûç'kê cimetê wan merya dik'ene, ku dikine fîqe-fîq, destê wan cêvêdaye, lê barê giran ser pişta jinêye.

Qelîbotkeke xweye mayînda ("Merî û me'r") şayîr merîê bêşêkir gu-nekar kirine. Eva qelîbotka bi cûre t'eqla xweva nêzîkî ruhê efrandina cimetêye û te t'irê şayîr ji cimetê hildaye.

Qaçaxê Mirad nava emrê xweyî efrandarîêda gelek cara berbirî zar-gotina meye dewlemend bûye, nimûnêd wê veçêkirine. Ewî hîmlî ç'îrok hiltanîn û veçêdikirin ("Ç'îroka Mîrze Meh'mûd", "Qadirê neç'îrvan", "Dîwana kulîlka", "Gurganî Zîndanî" û yêd mayîn). Çawa nava ç'îrokê cimetêda, usa jî nava ç'îrokê Qaçaxê Mirade veçêkirîda merîê qenc al-tindariê dibin, merîê nep'ak têne altkirinê. Ew ç'îrok bi çapa sivik ha-tine nivîsarê.

Efrandinê Qaçaxê Mirad we'dê başqe-başqeda bi çend zimana (ûrisî, ermenî, gurckî) hatine tercmekirinê. "Ênsîklopêdîa sovêtîêye mezin"-da derheqa wîda hatye nivîsarê. Kovar û rojnemê kurdê welatê dereke-

ye progrêsiw jî derheqa wîda nivîsîne û efrandinê wî neşir kirine.

Qaçaxê Mirad jî hindava xweda lîtêratûra kurdaye sovêtîê bi tercmê tezeva daye dewlemendkirinê. Ewî gelek efrandinê şayîrê ûrîsa, ermeniya, gurca, ûkraîna, azêrya klasîk û we'dê nha tercmeyî zimanê kurdî kirine.

Nava emrê xweyî efrandariêda Qaçaxê Mirad usa jî nivîsara vekirîva mijûl bûye. Çend serhatîê wî rojnema "Rya teze"-da neşir bûne.

Vê berevokêda, ku rehmetî hela saxya xweda hazir kiribû û teslîmî neşiretê kiribû, ew serhatî cîwar bûne, ku ewî salê başqe-başqeda nivîsîne. Cîkî mezin p'ara romana wîye "R'ev û sit'ar"-e pêşin digre, ku sed yazix nîvcî ma, nivîskar pêr'a negîhand wê temamke.

P'ae serhatya p'irê derheqa Şerê Wetenîyê mezindanin, t'evgelekî kîjanî nivîskar bi xwe bûye. Serhatîê bi vê têmaê mînanî bîranînane: nivîskar derheqa wê yekêda dinivîse, çî ku ber ç'evê xwe dîtye. Wanda nîşandayîna wetenh'izya merivêd sovêtîê, dostî û bratya wan cîkî mezin digre. K'emaleke van serhatyaye mayîn jî ewe, wekî fikra wane terbyetkirinêye mezin heye.

P'ara romana "R'ev û sit'ar"-e pêşinda emrê p'areke cimeta kurdaye berî rêvolûsiyê li qeza Qersê tê nîşandayînê. Ew cî gelekî hukumî sermerya dîkin, li k'u nep'akya sinifa k'edxur, dostya cimetê kurda û ermeniya, erf-edet, deba cimeta me têne nîşandayînê. P'evgirêdana Xêço, Eslan, ewledê wan, dostîê, şerkarya wane tomerî miqabilî zulmkara cîkî sereke digrin. Ev p'ara romanê bi dema r'evêva kuta dibe û fer'ih' tê k'ivşê, wekî peyhatina wê wê hebûya.

Em bawerin, wekî ev berevoka Qaçaxê Mirade vekirî nava lîtêratûra meye tezedê wê cîê xweyî layîq bigre.

Qaçaxê Mirad "Min çî dît"

Yêrêvan, 1981

Heciyê Cindî, Ji mirinê yek ji avakerên Kurdolojiyê 32 sal derbaz dibe

 Jêgiran

Heciyê Cindî an jî Heciyê Jndî (z. 18'ê adarê 1908, Qers - m. 1'ê gulanê 1990) nivîskar, lêkolîner û filologê kurdê Sovyetê ye. Yek ji avekerên Kurdolojî ye.

Cindî di 18'ê Adara 1908'an de li gundê Yemençayir ê herêma Qersê ku wê demê herêma Împaratoriya Rûsyayê bû, weke zarokê malbateke êzîdî hatiye dinê. Di sala 1878'an de malbata wî ya li Qersê ji ber Şerê Cîhanê yê Yekem û piştî destwerdana Osmanî û Rûsyayê (paşê Sovyetê) koçî gundên Qundexsaz û Elegezê yên Ermenîstanê dike. Di vê pêvajoyê de Heciyê Cindî ji bilî birayekî xwe hemû malbata xwe di nexweşî û komkujiyan de winda dike. Di sala 1919an de li Alexandropolê li Yetîm-Dera Emrîkayê bi cîh dibe û paşê di sala 1926an de birin Lenînakanê.

Di navbera salên 1929-30-î de li Qundexsaz û Elegezê xwendiyê û di sala 1930-î de dibe berpirsê xizmeta çandê ya rojnameya kurdên Sovyetê Riya Teze. Di vê heyamê de di Radyoya Êrîvanê de beşa kurdî ya nûçeyan de kar dike. Di sala 1933an de tevî Yekîtiya Nivîskarên Ermenîstanê dibe û di heyama paşerojê de beşdarî Kongreya Nivîskarên Sovyetê dibe. Di 18'ê Adara 1937'an de bi sîcên sîxurtî, netewepereştî û dij-şoreşê di çarçoveya Tevkujiya Mezin de tê şandin girtîgehê. Piştî salekê, bi saya kampanyayên rewşenbîrên ermenî hat berdan û împîç kirin. Lê nehiştin ku ew di berhemên xwe yên berê de bixebite, bi alîkarî û piştgirîya Aleksander Fadeyev, wî karê nivîsandina berhemên xwe yên edebî domand.

Di sala 1940î de bi mijara “folklora kurdî” doktoraya xwe ya felsefeyê qedand. Di sala 1941an de hukûmeta komara Sovyeta Sosyalişt a Ermenîstanê bi biryara jimare 909 alfabeya Şemo-Ma-

rogûlov betal kir û alfabeya kîrîlî ferz kir û ji Cindî hat xwestin ku alfabeya kurdî ya ku ji tîpên latînî pêk tê biguherîne. Alfabeya Kirîlî Cindî di sala 1946an de xwendina xwe qedand û di heman salê de alfabeya nû çap kir. Ev alfabe di perwerdehiya kurdî de li Sovyeta Ermenîstanê, Sovyeta Gurcîstanê û çend komarên Sovyetê yên Asyaya Navîn dihat bikaranîn, her wiha ev alfabeya nû di rojname, pirtûk û materyalên dersê de jî dihat bikaranîn.

Di sala 1959an de li Akademiya Ermenîstanê di beşa Rojhilatnasyîyê de dest bi xebatê dike. 8 salan serokatiya beşa Kurdolojiyê kir.

Ji sala 1968 heta 1974 li zanîngeha Yêrêvanê dersên edebiyata kurdî û kurdî dide. 15 pirtûkên folklor û edebiyatê, 33 pirtûkên dibistanan, 19 werger û 7 pirtûkên pedagojîyê gelek pirtûk nivîsandine û wergerandine.

Heciyê Cindî di 1ê Gulana 1990î de jiyana xwe ji dest da.

PIRTÛKÊN NIVÎSIN

Berhemên pêşîn ên Heciyê Cindî di sala 1930an de hatine çapkirin. Di salên 1930î de ji bo dibistanên kurdî pirtûk nivîsandine. Çend berhemên wî ev in: “Çîrokên gelêrî yên kurdî”, “Sibeha teze” û “Folklorê kurdî” di şeş cildan de, ya yekem di sala 1961ê de hatiye çapkirin. Cindî xebatên zaniştî li ser folklor û edebiyata kurdî kiriye. û helbestvan. Di sala 1967an de romana xwe ya dîrokî çap dike. “Alîkarî” çap dike.

Heciyê Cindî zêdetirî 110 pirtûk, berhevok û berhemên wêjeyî yên cûrbecûr hene û heta niha jî berhemên wî yên neçapkirî hene.

DRA. 08.11.2021

Çend rûpel ji jiyana Ereb Şamîlov

■ WEZÎRÊ EŞO

Navê Erebb Şamîlov hela hê biçûktîyê de ber guhê min ketibû. Lê min ew, çawa divên, ne dîbû, ne bîna bû. Dema ez bûme xwendekarê Unîversîta Erebb Şamîlov Erîvanê, êdî gelek caran navê wî ber min hildidan. Û tişteki ecêb û hewaskar ew bû weki ne ku tenê wekîl, fikir-dar û intelleksiya Kurdan navê wî hildidan, ew bîr dianîn, lê wusan jî gundiye sade, mirovên kalû pîr. Û ewan bi hisret, hezkirin navê wî hildidan. Erebb wexteke dirêj bû ne li Erîvanê bû, lê nivîsarên wî, xazma “Şivanê Kurd” di nava cimaetê de dihate bîranînê. Hetanî hatina ErebbŞamîlov min hîmlî derheqa wî de ev gotin zanibûn: ew hîmdareki edebîyata Kurd ya Sovyetê, zane ki dîrok, edebîyat, folklor û etnografya cimaeta xwe ye, erheda (welhasil) şuxulkareki cimaetê (civatê) û medenîyetê yê herî kivş e. Digotin, weki zimanê Kurdî pir rind zane, lewz, zimanekî letîfî dêv de ye. Hema wusan jî digotin: “Mala Erebb şewitî, zimanê har-maran dêv de ne, kurmancîya ew zane ki zane!”. Digotin, weki Erebb Şamîlov çend zimanên rohilatê û rojavayê rind zane. Bi gotinekê, hetanî hatina Şamîlov û heta dîtinê êdî derheqa wî de fikreke gelek baş li bal min çêbibû û mindi dilê xwe de digot: “Gelo ew wextê bê, weki ez bi çavên xwe wî emekdarê medenîyeta me bibînim”. Û ew wext hat. Rojekê min di rojnemeya” Sovetkan Hayaştan” de agahdarîke Ajansa Ermenîştanê ya Telegrafê ya resmî xwend, tê de dihate gotin ku bolşevîkê kevin, nivîskarê Kurd Erebb Şamîlov vegerîya Ermenîştanê. Cimaeta Kurd, wusan jî ya Ermenîya ew nûçeya xêrê bi şabûn qebûl kir. Û ez bi bêsebir hêvîya wê rojê bûm. Dema ji min re wê li hev bê, bextê min wê lêxe, ezê wî emekdarê edebîyata me bibînim û ew roj jî hat. Nîveka salên 1950’yî redaksiyona rojnameya Rîya Teze li avaya ser kuça Karmîr Banekê bû. Ez timê diçûme wira. Wek miqaledar, min informasyon û miqalên xwe dibirin, yekê jî, lawik didîtin, bîna min ji wan derdiket. Carekê ez çûme redaksiyonê, min dixwaşt redaktor bibînim.

Min derê oda wî vekir û dema min dît mirovek li bal e û ew dipeyîvin, min nexwaşt wan şerpeze bikim û hindav de derî girt, pašta vekîşîyam. Lê belê redaktor ez dîtîm û ez teklîfî hundir kirim. Min gotê wekî ezê paşê bêm. Ew mirovê nenas jî wekî piştî wî min de bû, ser milê xwe zivirî û li min nihêrî. Ez bi lez jî qatê çaran peyayî jêrê bûm û êdî ji avayê 50-60 mêtroyan dûr ketibûm. Min hew bihîst - yek wê dûrva gazî min dike û navê min hildide. Ez pişt xwe ve zivirîm: Eva Mîkayîlê Reşîd e, rehmetî şaîrê me û wergervanê rojnameyê. Ew hat gîhişte min û mîna xwe hercar, bi heydade (heybet) got:

- Kuro, pašta bizvire, em herin redaksîyonê, Erebb Şamîlov gazî te dike. Nişkêva dilê min kuta; ez çawa şabûme, wekî mirovekî wusan navdar besa min, cîwanê xwendekar kirîye, hewceyî dîtina min e. Heta em gihîştî cîhêcîh, hezar û yek fikir di serê min re derbas bûn; gelo çima gazî min kirîye? Divek yekî mayîn ez şibandibim? Ew jî naqewime, çimkî redaktor niha gotîye: ez kî me. Wusan e divek bavê min nas dike. Lê belê mena eynî qet di fikra min re derbas nedibû. Ber derê oda redaktor dilê min wusan lê dixwişt, te digot tê, qefasa min derê. Hilkişyabûn çar qatan jî “teqil” dabû xebata dilê min. Ez çûme hundir.

- Keremke, rûnê Wezîr can, redaktor got, hevalê Şamîlov dixwaze te bibîne, bona wê yekê me Mîkayîl li pey xişt.

Ez rûniştîm, raşt pêşberî Erebb Şamîlov. Min berê hew zanbû Erebb Şamîlov yekî govdekî bejnbilind e, simêlê reş yên pali kê (qalind) lê. Lê pêşberî min mirovekî nîvçe rûniştibû, çevne gire, reşe aqil lê, bê rû û simêl.

- Dêmek, tu kurê Eşo yî’ Erebb Şamîlov jî min pirsî, te digot me êdî gelekî xeber daye û ew dûmahîya gotinên xwe tîne.

- Belê, min got û şermana xweydanê ji ser min re avît.

- Eşoyê Hutî

- Belê
- Mala we ji aliyê Qersê, ji gundê Şîrînkoyê hatîye?
- Belê wusan dibêjin.
- Hutî heye?
- Na xêr, çûye rehmetê.
- Lê Xem, Xema pîrika te?

Dema ewî navê pîrka min hilda, gurzîyên sawê bedana min re derbas bûn. Wekî ewî navê kalkê min zanibû, ez ecêbmayî nemam, çimkî Hutîyê kalkê mim mirovekî navdar û naskirî bû. Lê dema navê pîrka min hilda, ez şaş û metel mam, wekî pey ewqas salan re çawa navê wê bîr nekirîye.

- Reme li Hutî begê, Xemê be, min nanê ber destê Xemê gelek xwarîye. Ereb Şamîlov hêja niha edil dest bi bi gotinên xwe kir:

- Hêna Şerê Cîhanê yê Yekemîn bû, lê berî reva 1918'an bû. Ez wê demê li gundê nehîya Dîgorê ya Ezdîyan digerrîyam, min spartina Bolşevîkan diqedand, bi karê şoreşê ve mijûl dibûm. Derece wusan qewimî min gotî xwe wedelî tada (demeke derbasok) sepe bikira (veşarta), ber çavên dîwana padşê neketama. Û min biryar girt xwe bavêjim ber bextê maleke kivş, mirovekî baş. Wê hênê mirovekî herî navdar kalkê te yê rehmetî Hutî beg bû. Hebûna wî ya giran tune bû, lê mirovekî nandar, bilyan û qedirgir bû, navê begtîyê lê kiribûn, wek nîşana qedgirtinê. Layîqî navê xwe bû, ocaxa wî ocaxa enzel (qonax) bû, mala ber û mêvanan. Gelekî bejna xwe hez dikir, papaxê kew, sapogê xas, qayîş-qeme gelekî bejna wîya bilind, navkilka zirav dihatin. Hutî beg yekî zerîn û bedew bû, simêleke xweş lêbû. Ez weke du mehan di mala kalkê te yê rehmetî de mam. Kê şika wê yekê bikira wekî şoreşger, bolşevîk di mala beg de xwe veşartîye. Kî dikaribû ser sama (heybeta) Hutî begê biketa, bihata mala wî binêrîya. Dîwanê, dewletê ew nas dikir, ewî bi nanê xwe

karkerên dewletê gişk kor kiribûn. Dema min di kox de nivîsara xwe dîkir, zarokên Hutî begê dahatin dora min, heyr û hejmetkar metelmayî li destê min, li nivîsara min dinhêrîn. De, feqîra zanibûn nivîsar çi ye? Wê hênê dibîstan di gundê kalkê te de tune bû, nava 16 gundê Ezdîyan de tenê li Bacelûyê hebû. Erê, zarokên Hutî pir nîn bûn, ez dibêim kur û qîzek bû. Kur wek çavên xwe, delalî xweyî dîkir, ew jî bi sapok bû, bi têleke poxikkirî. Kincên here xas xwe û kurê xwe re ji Qersê danî, heylo ji Tiflîsê dida anînê. Paşê Ereş Şamîlov pîrsa xwendina min kir, neferê mala me kir û ez borcdar kirim, wekî carekê bavê xwe bînim bal wî; gelekî dixwaşt kurê Hutî begê bibîne. Ez bêjim; keysetê Ereş Şamîlov wusan bû; wî timê dixwaşt mirovên sade, gundî û bajarvanên Kurd bibîne, pîrs û pîrsîyarîka ji wan bike. Vira cîh e bê gotinê, wekî paşwextîyê min tiştêkî wa bal Ereş Şamîlov texmîn kir; eger rojekê biqewimîya, wekî kesî Kurd mala wî nebûya mêvan, ewê bi xwe derket, biçûya kuçê Erîvanê, ya jî li kuşa bigerîya, heta yekî ji gund hafî, jin bûya mêr bûya, bidîta, pê re dipeyivî û hêja bi dilekî bariştan vedigerîya mala xwe. Min got wekî peyî 40-50 salan re Ereş Şamîlov navê pîrka min bîr nekirbû. Lazim e bidim kivşê, wekî ez paşwextîyê jî ser bîra wî ecêbmayî bûm. Ewî ne ku tenê navê mirovên çê ji bîr nedikir, lê wusan jî zanibû fêlankes, yan bêvankes ji kîjan êlê ye, kîjan qebîlê û berê, ji mala kê ye, nevîyê kê ye, bi gotinekê, çawa divên, heft govek bavê wî jî nas dîkir. Bi vî tehrî, ewî bawer bikî, hemû Kurdên Êzdî nas dîkirin. Ji rasthatin, dîtina pêşin şundatir min Ereş Şamîlov gelek caran dît, pê re qise kir. Komela nivîskaran de, radîyoyê de, redaksîyona Rîya Teze de, Akedemî, kûçê de û bextê min hebûye gelek caran bibim mêvanê wî, oda wî ya xebatê de, ber textê sade, ber maşîna herfa ya piçûk bibînim. Xeberdan, pîrs-pîrsîyar hez dîkirin, lê xebardana dirêj hez nedikir. Dema şixul xelasbûyî hesab dîkir, êdî tu didayî femandinê, wekî

lazime tu herî. Dema tu diçûyî mala Erebe Şamîlov û payê pirîn ewî bi xwe derî li te vedikir. Bi beşerek xweş tu qebûl dikirî, digot:

- Ew tu yî, keremke, keremke werê. Îro şuxulê min li hev ketîye, bêje, ka çi lazim e, çi alîyê min dikeve?

Wusan leza-beza sivderê de ji te re digot û te êdî qurs ax ne dikir herî hundir.

- Tê herî? dema te karê çûyînê dikir, ewî dipirsî: Tişteki nake, careke dine were, emê hinekî ji xwe re xeber bidin.

Careke din diçûyî, dîsa tu bi beşereke xweş qebûl dikirî û ji gotinên wî yên pêşîn kîvş dibû, wekî wê te çawa lazim e qebûl bike.

-Keremke, digot, wî tu ser çevan re bêtî, were otaxa min, em hinekî galegala bikin.

Em diçûne otaxa wî. Li wir xenjî karyola wî, dolava pirtûkan û textê (masa) wî yê xebatê tu tişteki mayîn tune bû, hemîn maşîna wî ya çapkirinê ya piçûk timê li ser wî texteyî danî bû. Timê jî rûpelê nîvcî herf-rêzkirî tê de bû.

-E, Şamîlov ber textê xwe, cîhê xwe yê xebatê yê hergav rûdinişt, tu jî hemberî xwe didayî rûniştandinê û dest pê dikir, de bêje, qe hal-wextê te çawa ye, zarokên te, jina te silamet in? Bavê te qe tê?

- Gişk silamet in, em hemû saxî û silametîya te dixwazin, min bersîva wî dida.

Lê te negot, bavê te qe tê?

- Welle van dawîyan hê nehatîye.

- Ca wekî tê, ese (sedîsed) bîne mala me, malavo, ez dixwazim kurê Hûtî begê bibînim. Te eva çend sal in soz daye, lê hela hê nebûyî xweyê soza xwe.

Raştî jî, Şamîlov timê besa bavê min dikir. Ewî di jîyînê de bavê min

nedîtîbû, diha raşt tenê piçûktîyê de, lê çawa kurê nasê wîyê hezkirî û mirovê bi salan mezin, dixwaşt bidîta.

Paşê Şamîlov pirsar hal û wextê Kurdên dereke dikir:

- Ez heyrana te bim, ew zarî dibû, mîna tişteki hêvî bike, tu qet haj Kurmancên me heyî, gelo halê wan çi ye?

Eger gotinek zanibûya, te jê re digot, lê eger na, ew ber xwe diket. Lê wî zanibûya ese ji te re digot.

Paşê pirsar ronakbîrîya me, karên ocaxên meyên medenîyetê te dikir. Tişteki ne dilê wî bûya, ese dida der. Wê şunda, te hew dinêrî, Şamîlov nişkêva xebardan, gilî-gotin wusan tomerî, gulover dikirin, wekî te bixwaşt-nexwaşt, rabûyayî, biçûyayî ...

Min paşê, derengî mena bî xeysetê wî yê ecêb derxişt. Erebb Şamîlov gelek salan ne li Ermenîstanê bûye, ji derecê medenîyeta civata me qetîyayî bûye. Loma jî ewî hewl dida, mîna tişteki, wedê wundakirî vegeŕîne. Ew gelekî dixebitî, bawer bike hemû seetên rojê. Maşîna wî ya piçûk li ber bû û wî bi tiliyê xwe yê kaltîyê yê ziravbûyê teqe-teq lê dixwaşt. Bisaya vê xebathezîyê, vê şuxilkirina mezin bû, wekî di nava çend salan de wî çend efrandinên pirrûpel nivîsîn û dane weşandinê. Bi raştî jî wî heyfa xwe ji wedê wundakirî hilda. Bawer bikî, tu xwendekarekî Kurdên dereke, ku li Moskovayê, Lenîgradê hîn dibûn, tune bû, ku bihata Ermenîstanê, Erîvanê û mala Erebb Şamîlov nemaya. Carekê min gotinek bîhişt, go xortekî Kurd ji Moskovayê hatiye, çûye mala Şamîlov. Evê te jê re ezet-hurmet kirîye û di dawîyê de zorzor sed manat “serva” kirîye.

-Tu xwendekar î, Şamîlov gotibûye, wê kêrî te bîn. Belê alîkarî tenê nedabû wî...

Carina jî, wedê wî hebûya, masa ber te dida raştkirnê. Xwarina wî ya here hezkirî kebab (şîşlik) bû an jî qelî bû. Gelekî ji goştê pêz hez dikir.

Min pê derxistibû, wekî çavên xwe îlahîyên neferan tu tiştî de nedihîşt. Carekê tişteki waha qewimî. Ez ji navbirîya xebatê vedigerîyama cîhê xwe, radîyoyê. Li qatê sisîyan jina min sekinîbû, hêvîya min bû.

- Hêja mirovekî gundî li vira besa te dikir. Ji lawikên redaksîyonê dipirsî, min jî şerm kir nêzîk bim.

- Kî bû, mirovekî çawa bû? Min pirsî.

- Yekî nîvçe, kal bû, şilyape (fotor) sêrî bû. Ez şaş û metel mam, gundîyê me yên niha jî rind xwe dikin, ji bajarvanîya baştir.

- Xwedê, ez dilê xwe de fikirîm, ew gundîyê mîna bajarvanîya wer-girtîya kî ye? Min çiqas zor da hişê xwe, nikaribû jê derxista.

- Elbeke piçûk jî dêst de bû, kulfeta min ser de zêde kir, teyê qey bigota ezê ji wê elbê derxim, çika ew kî ye.

Xeberdan devê me de, jina min alîyê nêrdewana nihêrî û bi heydade got:

- Va ye, va hat!

- Ez fetilîm û min bala xwe dayê, eva Erebe Şamîlov e.

- Qîzê, Erebe Şamîlov e.

- Çi dibêjî? kulfeta min şaş û metel ma.

- Malavo, Erebe Şamîlov bîn lê çikyaye, elba wî ya piçûk dêst de, dûr ve got, ez vespê de te digirim, tu ku yî?

- Ez çûbûm nav bajêr, bêtî te ne loşî can be, min nan xwar.

- Efiyet be, xêreke jê bibînî.

Şamîlov hat, pêşberî me sekini û mîna hergav pirsî:

- Pirsî edib tê tune be, keça min kî ye, kurmanc e?

- Belê, min bersîva wî da, kulfeta min e.

Erebe Şamîlov gelek şa bû, dest pê kir pirs û pirsîyar ji kulfeta min kir. “Tu ji kîderê yî? Dê û bavê te mirovên kîjan êlê ne, ji ku hatine” û gelek pirsê dinê. Kulfeta min ya belengaz soro-moro bûbû, çimkî nika-

ribû bersîva pirsê wî tam bide. Min dît na, wa nabe, alîkarî dayê. Ereba Şamîlov jê re di nav çend deqa da ewqas gilî derheqa dîroka êla wan de, derheqa Zuqurîya û Cangîr Axa de gotin, wekî divek ewê nava temamîya emrê xwe de nebîhistibû.

Ezî hinekî bal Şamîlov rûvekirî bûm û min jê pirsî:

- Eva çi elb e?

- Bavo, ewî dest pê kir, gotin fêza radîyoyê klûbnîk stendine. Klûbnîkan re, ew zivirî ser kulfeta min, kurmanc dibêjin toqatk (çîlek) . Min got, ez herim zarokan re bikirim, ew jî bextê min re xelas bibûn. De, tişte nake, ezê herim ji sûkê bikirim. Ez ji vîra vegeirîyam, biryar da ku bêm serîkî te xim û pê bihesim, ka van dawîyan çima wunda bûyî, kîvîş nabî?

- Şuxul-emel nahêlin, apo, hema serhêsa bûm, ezê ese bêm.

- Qîza min jî bîne, ese mîna ya bavê xwe nekî. Dema xatirê we, min gelekî serê we êşand, Ereba Şamîlov got û çû.

- Apo sebir ke ezê bêm te verêkim.

- Na, ne lazim e, tu qîza min verêke.

Ereba Şamîlov çû, ez vegeirîyam û min dew ji kulfeta xwe kir:

- Qîzê, te ji çi derxişt, wekî Ereba Şamîlov gundî ye? Ne axir tîmêla (xeml) wî da tu tişteki gundîtîyê tune.

- Mîna gundîya xeber dida, kulfeta min mena şabûna xwe eyan kir.

Lê Ereba Şamîlov çiqas firnax dibû, çaxê dibihîst, wekî keçek ya xortekî Kurd îdareke xwendina bilind de hatîye qebûl kirin. Hindike em bêjin, şa dibû. Kêjî, nas bûya, nenas bûya hêvî ji Şamîlov bikira, wekî bona qebûlîkirinê alîkarîyê bide, ewî xwe nedihêvişand, wê kaltîya xwe pêşîya cîwanan, dê û bavê wan diket û kîderê lazim bûya, diçûyê, qedrê xwe xerc dîkir, carna bi hêvî, rica dîkir, tek xort û keçek Kurd înstîtûyê de bê qebulkirinê. Ez bi xwe gelek xort û keçê Kurd nas dikim yê ku

bi alîkarîya Şamîlov înstîtit, unîversîte ya jî texnîkumê de qebûl bûne. Erebb Şamîlov ne mirovekî qure, babax û kubar bû. Çawa cimaet dibêje: çûkan ra çûk, mezinan re mezin. Lê bi vê re tevayî qedrê xwe rind zani-bû, xazma qedrê wan nav û nîşanan, wê sîyanetê, ya ku partîyê, dewleta Sovyetê dabûne ser wî. Ewî gelek hez dikir bîr bîne, wekî navê proffe-sorê sor li ser wî ye. Erebb Şamîlov her cejneke de, her civîn û êvarîkê de pêşîra xwe bi nîşan û madalya ve dixemiland. Û divê bê gotinê, wekî mirovê ku xeysetê wî rind zanibûn, ew yek bi kubarîyê, babaxîyê re girê nedidan. Dema nîşan û madalya pêşîra xwe dixistin, ne ku dixwaşt bi vê yekê bêje: “Bala xwe bidinê, ez çito mirov”, lê daxwaza wî girtina qedrê wan rewa bû. Ew bi wan nîşan û madalya ve fîrnax dibû, mîna zarokekî bi kincên xwe şa dibe, ew wusan şa dibû. Erebb Şamîlov bav û malxwekî xemkêş bû. Ewî qedrê kulfeta xwe Marîya Vasîlevnayê ge-lekî zanibû. Dema ez diçûm mêvanîya wî û kulfeta wî li ortê hazir bûya, te hew dinêrî nişkêva digot:

- Meta te kulfeteke şîrhelal e, ew nîn bûya, divek ez niha sax nînbû-ma. Ewê rojê çetin de gelek alîkarî daye min, ez keda wê nikarim bîr bikim. Marîya Vasîlevnayê jî alîyê xwe de gelekî xemxur bû himberî wî. Min time texmîn dikir, wekî ew sibê heta êvarê, çawa dibên, totan-ga (kesê tê-diçe) wî ye, wê pîrtî û bêsehetîya xwe, çawa cimaet dibê, mîna destmaleke ser desta qulixê wî de ne. Min hertim tê derdixist, wekî Marîya Vasîlevnayê hez nedikir, dema mêvan gelekî rûdiniştin û mêrê wê mijûl dikirin. Ewê nedixwaşt, wekî bi xebardana dirêj karê Erebb Şamîlov şerpeze bikin, ewî ji xebata efrandarîyê bibirin yan jî aciz bikin. Bona saxlemîya wî gelek xemxur bû. Ji “tîrsa” wê Erebb Şamîlov newêribû eşkere cixarê bikşîne. Dema ez diçûm mala wan, ewî timê ez teklîfî oda xwe dikirim, derî li ser me de digirt û destûr dida ez cixarê bikşînim, wekî ew jî bikaribe “ taldê” min de duyê cixare kê hecam

bik.e. Ereba Şamîlov gelekî ewledên xwe hez dikir. Keça wî Meyanê zûva mêr kiribû. Herdu keçên piçûk bal wî bûn, di van salên dawîn de mêr kirin. Ereba Şamîlov navê Kurmancî li van herda kiribû; navê yekê Asê bû, ya dinê Zînê, navê mêrxasa destana Ehmedê Xanî û beyt-serhatîya cimaetê “Mem û Zîn”. Ewî herdu keç jî gîhandin mirazê wan, kirin xweyê xwendina bilind. Ez carekê çûme mala wan, lê herdu keç jî ne li mal bûn. Ereba Şamîlov ji min pirsî:

- Te keçikên min dîtine?
- Çawa nedîtine!
- Lê van dawîyan?
- Na, min gotê, van çend salên paşin min nedîtine.
- De tu kerama xwe sebir bike, Ereba Şamîlov got û ji oda xwe derket.

Lezekî şunda wênayek dêst de ew vegehiya.

- Eva wênê an yê herî paşin e, çendekî pêşta tevayî kişandin, Ereba Şamîlov got û wêne dirêjî min kir.

Min bala xwe dayê, herdu xûşk li pîya li rex hev sekinîbûn û tiştêkî hewaskar, herda jî kincê kurmancî, rihale milletîyê wergirtibûn, kofîkîtan, dêre û êlekê cimaeta me. Ereba Şamîlov bi şabûn heyî li min dinihêrî, heyî li wênê ewledê xwe yê hezkirî. Min texmîn kir, wekî ew gelekî bi wana fîrnax dibe û xazma bi wê yekê, wekî qe na, di wêne de ewan bi kincê milletîyê tene xuyan. Bêyî gotina min, nivîskarê hezkirî ew wêne pêşkêşî min kir. Lê keçên Ereba Şamîlov tenê bona kişandina wêne kinc û rihale milletîyê wernedigirtin.

Carekê ez çûme dîlanekê. Ew dîlan li Erîvanê bû. Ereba Şamîlov hati-bû û keça xwe Zînê jî bi xwe re anibû. Zînê kincê kurmancîyê wergirti-bûn. Dema ew û bavê ve ketin govendê, min texmîn kir, wekî Zînê qaydê kurmancîyê rind dilîze. Bavê ew hîn kiribû. Rojekê pê hisiyam wekî Ereba Şamîlov likumîye û lingê wî guzikê de şikestîye. Eva jî beseke ne

bi xêr bû, çimkî dîyare e, wekî heştuyê kal û pîran yê şikeştî dereng ya jî çetin diceribe. Ez serda çûm. Hêvîyê bûm, wekî ezê wî halekî melûl û sexîr de bibînim. Lê dîsa ew Ereba Şamîlovê wek berê bû, tenê wekez (gopal) girtibû xwe û lingê wî girêdayî, ser alçîyê de, pêçayî bû.

Dewsa ez ber dilê wî da bêm, ew ber dilê min û kulfeta xwe de hat.

- Tişteki nake, ewî bêminet got, malavano, wê biceribe. Doxtora got, wekî xurekê rind bixwî, wê zû biceribe.

Ez şaş û metelê vê bînfirêhîya wî mam. Divek hema vî xeysetî ew û saxlemîyê ve xweyî kirin, dema ew gelek salan li xerîbîyê bû, di nav mercên hema xirab de dixebitî. Dema ez derketim êdî mîna hercar, Şamîlov ez verê nekirim. Kulfeta wî derî li ber min vekir û dema xal-xatirê ez ber dilê wê de hatim, ew girîya û bi kelogirî ji min re got:

- Na, Wezîr, Ereba ji vî lingî here. Gelek cîhekî çetin, gûzikê de şikestîye. Ew çî zulm bû, Ereba sapî silamet ...

Û êdî nikaribû xeber bida. Ez dîsa li ber dil de hatim û çûm. Lê Ereba Şamîlov ji ling, ji şikestina heştu nemir. Dilê wî sekinî. Ew dilê ku bîna serketina xebata Lenîn, Oktobra Mezin û azadî, bextewarîya cîmaetê li Qersê û Sarîqamîşê, li Kafkasa Şimalê û Lenîngradê, li Moskovayê û Erîvanê, li pala çîyayê Elegezê û Axmixanê, gelek cî û waran kuta bû, lê xistibû û niha, dema êdî weştîya bû, peyî qedandina rêke dirêj ya sîyanet re sekinî. Lê karên wî, efrandinên wî man bona cîmaetê, bona dilşahiya mirovan.

Transkripsiyona ji Kirîlî: Rohat Alakom

ELÎYÊ EBDULRREHMAN:
Jîyan û berhemên wî.

■ Dr. Maruf Xeznedar

Elî kurê Ebdulrehmanê kurê Mihemed e, di sala 1920an de li hewar-geha gola Çilûrê (îhtîmal e ev golaÇildirê be –Z. Avci) ya qezayê Wanê li bakurê Kurdistanê hatîye dinê/ Mala bavê wî girêdayî beşê Brûkiyan ya eşîreta Zillîyê ye. Li derûdora tefandina serîhildana Şêx Seîdê Pîran mala Elî wekî bi hezaran aîleyên kurd ên din koçber bûne û piştî li Nexçewanê bi cih bûne. Heta serdema temenê xwe yê xortînîyê ji Elî re li hev nehatîye çavê wî bi xwendegehekê bikeve. Di sala 1933an de mala xwe anîne Ermenîstanê û li gundê Hesenlû yê li navçeya Êçmî-yadzînê bi cih dibin. Elî xwendina xwe ya seretayî li wî gundî temam kir û yekser bû xwendekar di enstîtûya mamosteyên zimanê kurdî de, di sala 1937an de bawernameya wê dezgehê wergirt. Ji wê salê heta 1940î di xwendegeha Musakendê û ‘Emoyê de, ku herdu gund xwedîyê yek xwendegehê bûn, mamosteyî kirîye. Bi destpêkirina şerê Rûsya û Almanyayê yê di sala 1941an re, Elî bi partîzanê yekîneyek Rûsyayê. Xebata çekdarî ya partîzanî di sengerên eskerî de girantir bû. Elî di komarên Ukraynayê û Belorûsyayê de şer kirîye, di nav erd û çiyayên Romanyayê, Polonyayê, Çekosloviakyayê û Almanyayê xebitîye. Çar madalye jê re hatine dayîn: ya yekê Partîzanî, Serkevtina Şerê Niştîmanî, Rizgarbûna Mozkovayê û Rizgarbûna Qafqasyayê. Piştî xelasîya şer di gulana 1945an de vegeraye Ermenîstanê û xwe bi kar û barên edebîyatê ve mijûl kirîye. Piştî wê cardin hewesa wî ya xwendinê bilind bûye û berê xwe daye Azerbaycanê û di xwendegeha enstîtûya mamosteyan a Bakûyê de bûye xwendekar û di sala 1949an de ji wê dezgehê diploma wergirtîye. Piştî wê wî kirine birêvebirê xwendegehê. Di vî karî de gelek nemaye, piştî birêvebirîya perwerde û zaniştî jê re hat sipartin. Di sala 1953an de ji bo karûbarên zimanê kurdî û azerî wî kirin sekreterê wezaretê zanyarîyê ya Ermenîstanê. Rojnameya Rya teze ji bo xemlandin û firehkirina asoya bîra Elî bûye meydana meşqê, ji sala

1955an heta 1961an tê de nivîsên wî hatine weşandin. Desteya nivîskarên wê rojnameyê wî yek ji xwe hesêb dikirin. Di sala 1961an de Elî bû serekê sovxoza Kalînînê, ev yek ji sovhozên mezin ên Ermenîstanê bû. Sovxoz di Yekîtiya Sovyetê ya kevin de dezgeheke aborî ya ziraetê ya dewletê bû. Elî di vî karî de ma heta serdema xanenişînîyê û dawîya jiyana xwe. Piştî hilweşîna desthilata Zovyetê li Qafqasyayê (1991) û di netîceya şerê neteweyî û dînî di navbera ermenî û azerîyan de, malbata Elî koçber bûn û bi xwe jî di sala 1994an de koça dawîyê kir

BERHEMÊN WÎ YÊN EDEBÎ

Elî komê ziman dizanî û şarezayê edebîyata wan bû. Ji bilî zimanê kurdî, rûsî, êrmenkî, tirkî (azerî), qirgîzî, ozbekî û farisî dizanî. Ji nêzîk ve edebîyata wan nas dikir. Ew zemîn û çavkanî rê ji bo Elî xweş kiribûn bibe nivîskarekî li ber çav, ku dikare di van haletên xwe rê bîn dîtîn: 1-Elî wêneyê raşteqînî yê jiyana neteweyê xwe bû. Ji temenê şeşsalîyê ve tûşî koçberî, îşkence û derdeserîyên jiyane bûbû. Di temenê xwe yê xortîniyê de rêya partîzanîyê hîlbijartibû, vêca bûbû mamoste, piştî di rojnamegerîyê de xebitî bû, piştî di zîraetê de, lê hemî ev karên wî ku beşekî ji jiyane ne, ji bo xwendin û nivîsandinê bûye, ji ber ku jiyana raşteqînî ye.

2- Wezîrî Nadîrî yê pîsmamê Elî li ser wî wiha dibêje: Ew mamosteyê min ê yekem bû, min gelek îstîfadeyê jê wergirt û ez gelek jî jê hîn bûm. Destpêka pêşgotina behra edeba Elî di sala 1940î de dest pê kir, lê ji ber sebebê beşdarîya di şerê Rûsya û Almanyayê (1941-1945) de meşqa nivîsandina wî di vî navî de jênebû

Piştî şer bi raştî Elî wekî nivîskarekî rabû piyan û nav û deng da. Ya cihê gotinê ye ew e ku Elî wekî Erebe Şemo berhemên wî yên edebî ji çarçoveya pexşanê derneketine derve. Deh-duwazdeh şîrên wî yên

heyî, belgeyên wê ne ku eger mijara şîirê ji bo berhema edebe hilbijartî-ya dê şairekî baş jê derketiba. Di navenda edeba wî welatî de eger Erebnivîskarê yekem hatibe hesêbkirin, navê Elî pişt wî hatîye. Elî behemên xwe yên edebî bi giştî bi rêya pexşanê re nivîsandine. Çend perçe şîir jî hûnandine. Pexşanên wî ji wê mijarê ne ku di edebîyata neteweyên cîhanê de di orteyê de ne, wekî gotar û çîrokên kurt û çîrokên navîn (povîst) û roman. Di serdema Rya teze de kar kirîye û nivîs tê de weşandine, di nivîsandinê de midetê meşq û pêşketinê bûye û berhemên zêde pêk anîne. Di sala 1957an de, di kitêba “Nivîsarkarêd Kurda Ya Sovyetiyê” de çîroka “Morof” weşandîye. Ev kitêb berhema mezintirîn şair û nivîskarên kurdên Qafqasya Rûsyayê bûye

XATÊ XANIM

Xatê Xanim yekemîn komê çîrokên Elî ne di kitêbekê de weşandîye, di sala 1959an de li Êrîvanê derketîye. Noberê bi vî awayî berhemên edebî pêşkêş kirine û wiha gotîye: “Ez vê kitêbê, xwe ya pêşne çûk, pêşkêşî nivîskarê kurda yê ‘eyan dersdarê xwe yê ezîz rehmetî Cebare Nadîrî û birê xwe yê bêmiraz Qulîxan dikim”. Xatê Xanim ji çar çîrokên bi navê “Jina Kurd”, “Morof”, “Bextê Wî Zilamê” û “Bextewarîya ‘Emir’” pêk hatîye. Di nav van de çîroka serekî ya bi navê “Jina Kurd” e, navê wê Xatê Xanim e, ji ber wê çîrokê bi wî navî weşandîye. Du çîrokên destpêkî yên dirêj in, nêzîkî sed rûpelan in, duduyên din kurteçîrok in

DÊ (DAYÎK)

Berhemên giring ên Elî ew koma çîrok û şîiran e ku di sala 1965an de bi navê “Dê” li Êrîvanê weşandîye, ev ji şeş çîrokan pêk tê, ji van “Dê”, “Rasthatin” û “Du Dilê Hizkirî” ji çîrokên dirêj in. Yê din “Berdêlî”, “Du Jîyîn” û “Seyran” çîrokên kurt in. Her wiha di wê kitêbê de yazdeh

perçe şîirên Elî yên bi pênc perçe şîirên ji zimanê biyanî wergerandine ser kurdîyê hatine weşandin. Ya di vî warî de pêwişt e bê gotin ew e ku pêşgotina van weşanên Elî ji alîyê Erebe Şemo ve hatiye nivîsandin.

HIŞYARBÛN

Peywendîyên Elîyê Ebdulrehman bi nivîskar û rewşenbîrên başûrê Kurdistanê re hebûne. Di serdema Komara Kurdistanê li Mehabadê (1946) de komek xort ji bo xwendinê çûbûn Bakûyê, piştî hilweşna komarê ew wekî penaberên siyasî li wî welatî man. Di salên pêncîyî yên sedsala 20an de Rehîmê Qazî û Elî Gelawêj komek şîir û çîrokên edebî yên millî yên devkî yên ji kurdî bi navê “Uyanmaq” (Hişyarbûn yan Ji Xew Rabûn) wegerandibûn ser zimanê azerî, wisa dixuyê ji wan re pêk nehatibê biweşînin, belkî heta niha jî nehatine weşandin. Êdî Elî carek din wan tekstên azerî wergerandine ser zimanê kurdî (Diyalektê Kurmancîya Jorê) û bi navê xwestî yê “Kurê Kurd” di sala 1959an de li Êrîvanê weşandine.

NAVEROKA BERHEMÊN WÎ

Elî li Kurdistanê nemaye, wekî bi xwe dibêje li Kurdistanê nejiya-ye, lê bîrewerî, yadgarên bav û dêya wî û kes û nasên wî yên hezjêkirî wê axê bi awayek di nav dil û hinavê wî de çandine hîç hêzekê nekarî-ye bileqîne. Ji ber wê piranîya berhemên wî ji bo meseleya mebeştî rizgarîya neteweyî hatiye amade kirin. Ew civata tê de jiyaye li ba wî hezjêkirî bûye, Hîç rik û kîna wî li hemberê cîranên kurdan tunebûye, dilsozê deşhilata Rûsyayê û Ermenîstanê bûye, ev jî ji ber tîşka bîr û bawerîya sosyalîzma civatê meşandiye bûye. Elî yek ji wan bûye ku di wî welatî de hebûna meseleya kurdî ji bo wan ji hemî meseleyên din giringtir bûye. Ji ber ku hemî ew kurdên xwendewar di vî warî

de ne wiha bûne. Nivîsandina li ser daxwaz û xwesteka kurdan li ba wî û hemî Kurdistanê ye. Vê tevlihevî hêvî û armancên hemî ew milletên cîranên kurdan in kiriye. Qehremanan ji hemî milekî hilbijartîye. Li hemberê hemî kesî xerabî nekirîye geşbîn e, dergêhê Dozêxê jî li hemberê hemî kesên dijminê kurdan û bîr û bawerîya sosyalîzmê ne vekirîye. Elî li ser wê rêbaza ji destpêkî ya jiyana xwe ya edebî meşîyaye. Tu cure awayekî îdeolojî li balê diruşt nebûye. Di warê naveroka berhemê de aramîya bîrê li balê bi hêz bûye, tûşî hîç awa babetê tevlihevîyê nebûye. Guhertin di bîçima/stîla berhemên wî yên edebî de bûye. Her çend bi salan ve jî çûye, ziman û awayê wî ber bi pêşveçûnê ve çûye. Ji bo tomarkirina naveroka bîr û bawerîya xwe li mijar û qalibên nû geraye, pêşî qîmetê bi gotar, çîrokên kurt û dirêj dane, di nîvê salên şêstî û destpêka salên heftiyî yên sedsala 20an de, projeya nivîsandina romanê di destan de bûye, vî navî re mijûlê amadekirina romana “Gundê Mêrxasan” bûye.

ŞIIRÊN MILLÎ YÊN ELÎYÊ EBDULREHMAN

Elî nivîsandina şiiran nekirîye pîşe, lê hinek caran hewesa wî hatîye û wî jî bêdilîya dilê xwe nekirîye wan şiiran nivîsandine. Di şiiroke bi navê “Keça Kurd” de wiha nivîsandîye:

Qîza kurda tu husilcemalî
 Tu dilê min da ze‘f delalî
 Bejna te zirave ça sipîndar
 Qalçîçeka kaniya serdar
 Qîza kurda qîza kurda
 Tu letîfa eşqa dila
 Ez bengîme tu yara min î
 Devê te çûk diran mircanî

Gulîyî yarê gaz û nîvek
 Nolî keskesor, rihan gulek
 Li zozanê me kal û bava
 Şemal didî ter hîva şeva
 Ez aşîqim tu qudûmê min
 Qemet tu nebe merî hêç in
 Temam dinê wê yekê zane
 Bedewîya keça kurd ‘eyane
 Qîza kurda hîva yekşeve
 Şemal gej ça stêrk derdekeve
 Keça kurda kara xezal e
 Ew dilê min da ze‘f delal e
 Qîza kurda boy min ‘emre
 Ruhê min şevro wê digere
 Tu keça kurda ez kurê kurd
 Bes e li min xî gula û derd
 Ez boy te dinalim-dikalim
 Gelo xûna te da nagerim?
 Qîza kurda qîza kurda
 Tu letîfa eşqa dila

Di vê şîira sipehî de Elî bi keça kurd re gotûbêjê dike bi zimanekî sade û rewan, kurdîyekî saf, wesfê sipehîtiya wê dike, pesnê bejin û bala wê dide, ew nehênîyên di nav dilê wî de hene jê re eşkere dike û dixwaze tê bigehîne ew jî wê hez dike, ku ew bi xwe jî pêwiştê wê ye, ew jî jî Elî hez bike. Belgeya şair ew e keçik kurd e, Elî jê re dibêje, eger tu kurd bî ez jî kurd im, jî ber wê lazim e em jî hevûdu re bibin. Di şîireke din a bi navê “Kurdîstana Ezîz ra” de:

Kurdistana me tu çiqasî şîrînî
 Tu bo kurda ronaya çevanî
 Navê te her dilekî da gul e
 Çawa xûn av dîl da dixulxule
 Raşt e ez çûk bûm lê kal û bav
 Wur debên xûn kişyaye weke av
 Lê kurda şer kirîye mêrxasî
 Wetenê xwe nefrotîye tu kesî
 Xûnxora tu birîndar dîkrî
 Tu koka milletê me dîbrî
 Malhebûna te jî talan kir
 Dûr disekinî bi te qelif kir
 Ez lawekî kurda yî navsere
 Tarîqa te dexûnim seransere
 Dil û hinavê min dipêrite
 Lema jî sujdedarim ez ber te
 Ê min xandîye Feqî Teyran
 Ehmedê Xanî delalê dila
 Melleyê Cizîrî û Cegerxûn
 Dil-hinavê min bûne kaf û nûn
 Ew nalyane kalyane ji derda
 Riya azayê dane pêşîya kurda
 Her şereke wan bo me ocaxe
 Tu qewet tune ji dila derxe
 Dilê min î zelûl hêsa nabe
 Qelbê min î reşe qet qenc nabe
 Seba te qidûmê min şikeştine
 Ez zanim Kurdistan cîyê mêrane

Kurdiştan tu meskene bok-berana

Tarîq şedeye boy wan talana

Kuştina mêra mîratbûna mala

Reşheşê jina û daxa dila

Kurdiştana me tu çiqas şirînî

Tu bo kurda ronaya çevanî

Navê te her dilekî da gule

Çawa xûn nav dilda duxulxule

Elî vê şîirê di sala 1962an de hûnandîye, di dema desthilata eskerî ya Ebdulkerîm Qasim li Bexdayê li dijî mafê rewa yê kurdan dest bi bomberana başûrê Kurdiştanê kir û Şoreşa Îlona sala 1961an dest pê kir. Şair di vê lîrikê de bi êş û ezîyeta neteweyê xwe dijî. Her çend ew li welat nejîyaye û gelek zarok bûye ku ji wir koçber bûye, lê vê zêdetir evîndarîyê di nav dil û hinavê wî de çespendîye. Di vê şîirê de Elî yadê hinek ji sembolên rewşenbîrîyê dike, bi şanazî behsa Feqeyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Cegerxwîn dike.

Elîyê Ebdulrehman yek ji rewşenbîr û nivîskarê kurd yê Qafqasya Rûsyayê ye. Rola wî di pêşveçûn û firehbûna xwendewarî di civata kurdên wî welatî de giring bûye. Mamosteyê xwendegehê bûye, di roj-namegerîyê de kar kirîye, karûbarên çiftlixên zîratê meşandîye. Midetê pênc salan cengawerê sengerên şerê Rûsya û Almanayê bûye, lê pîşeyê wî yê bingehîn edeb bûye. Berhemên wî yên edebî yên dahênrawî di gotar û çîrokan (kurt û dirêj) de û romanên wî di çanda neteweyî yê kurd de nimûneyên bilind in.

Ji Kurmancîya Xwarê li ser ji bo Kurmancîya Jorê Ziya Avcî (Elîşêr); çavkanî

*Ji pirtûka “Dîroka Edebîyata Kurdî” a Maruf Xeznedar.

